



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdî Miqdad Mîhed Bedîrxan

Armanç

Hejmar, No: 147
Adar
March 1994
Buha - Price
20 SKR, 3 DM

Rojnameya Mehane

Li Kurdistanê û li Tirkîyê hilbijartinên herêmî :

Boykota DEP'ê bi kêrî RP'ê hat

◆ Partiya Refahê anketên ku berî hilbijartinê çêbûn, ser û bin kirin û di hilbijartinê de partiya herî bi qezenc derket.

◆ Li Kurdistanê boykotkirina DEP'ê bi kêrî RP'ê (Refah Partîsî) hat û ev partî ne tenê li Diyarbekirê, 12 bajarên din yê Kurdistanê jî serokatiya belediyan qezenc kir.


Li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê di 27'ê Adarê de hilbijartina herêmî çêbûn. 13 partî beşdarî hilbijartinê bûn. Partiya Tansû Çiller

DYP'ê ku di hukûmetê de ye di sê bu partiya yekem. Partiya Necmettin Erbakan RP' di hilbijartinan de herî bi qezenc derket.

DYP'ê %21.49 ANAP'ê %21.02, RP'ê %19.01, SHP'ê %13.61 DSP % 8.82, MHP % 7.96 û CHP'ê jî 4.62 deng kirin.

Partiya Refahê ya Erbakan li Kurdistanê zêdeyî dangan stend û di 13 bajarên Kurdistanê de serokatiya belediye qezenc kir. Ev partî ne tenê li Kurdistanê herwisa li Tirkîyê jî gelek ray bi dest xistin. Li bajarên Stenbolê û Anqerê jî namzetên vê partiye qezenc kirin.

Li bajarê Diyarbekirê hejmareke mezin dengên vala ji sindoqan derketin lê di netîcê de boykotkirina DEP'ê (Partiya Demokrasiyê) kêrî RP hat û dengên DEP'ê çûn vê partiye.



Partiya Refahê cara pêşîn e ku li Diyarbekirê serokatiya belediye qezenc dike. Refah ne tenê li Diyarbekirê qezenc kir, belediyan bajarên Kurdistanê yê din; Erzurum, Elazig, Sêwas, Adiyaman, Wan, Bingol, Meletye, Mûş, Wan, Bedlîs, Rêha, Sêrt jî

Partiya Turkeş MHP'ê li bajarên Erzincanê û Kersê serokatiya belediye bi dest xist. Partiya SHP'ê li Entapê, Dersimê û Hekariye serokatiya belediyan qezenc kir.

Dûmahîk: r.11

Halim Can

Encamên Hilbijartinê r. 4


S. Abdurrahman:

"Nabe em bibêjin azadiya Kurdistanê Başur misoger bûye" r. 5


Hendirên:

"Mîna ku ji rondikên te ji dayik bûme ne ku ji te dayê!"


r. 6-7



Ahmet Turk



Hatip Dicle




Orhan Dogan



Leyla Zana



Sirri Sakik



Mahmut Alinak

Mahkema Qanûna Bingeîn ya Tirkîyê rakirina immuniteta parlamenterên DEP'ê erê kir

Ewrûpî rabûn ser piyan

Mahkema Qanûna Bingeîn ya Tirkîyê rakirina immuniteta parlamenterên DEP'ê ji aliyê Meclîsê ve tesdîq kir û ji bo ku protestoyên Ewrûpiyan nerm bike tenê immuniteta Parlamenterê DEP'ê yê Şir-nexê Selim Sadak iptal kir.

Ev çend mehên dawiyê halê serokên Partiyên İktidarê û muxalefete yê Tirkîyê bû û digotin "PKK di Meclîsê de ye" "siya PKK'ê li ser Meclîsê ye" û pêwîst e em wan ji Meclîsê derxînin. Û ji aliyê psîkolojîk jî haziriya wê kirin. Di meş û

mitîngên ku ji aliyê dewletê ve dihatin organîzekirin ev babet bi kar anîn û bi gelê Tirkîyê jî ve tişt dan qebûl kirin.

Di vî warî de mesajên Serokê DEP'ê Hatip Dicle yê apolitîk jî rola xwe list û malzemeyên konkret da destê dewletê. Ji xwe şêla dewletê berê de belî bû ku ewê tahamulê hebûna parlamenterên Kurdan di Meclîsê de nekirin. Meclîs bi daxwaza generalan hereket kir û mazûniyeta 8 parlamenteran rakir.

Di 2'ê Adarê de bi dengên DYP, ANAP, Refah, CHP, MHP, BBP, DSP immuniteta (masûniyet -dokunmazlık) 6 parlamenterên DEP'ê; Hatip Dicle (Parlamenterê Diyarbekirê û serokê DEP'ê), Leyla Zana (parlamentera Diyarbekirê), Ahmet Türk

(Parlamenterê Mêrdînê), Orhan Dogan, Selim Sadak (Parlamenterê Şirnexê), Sirri Sakik (parlamenterê Mûşê), 2 parlamenterên serbixê Mahmûd Alinak (Şirnex) û Hasan Mazarci (Stenbol-berê parlamenterê Refahê bû) rakirin. SHP ku şîrkê hukûmetê ye jî di dema rakirina immuteta parlamenteran neketin meclîsê û dengên xwe nedan.


Bi rakirina masûniyeta parlamenteran ew ji aliyê emniya Anqerê hatin girtin û ew avêtin nezaretê. Selim Sadak û Hasan Mazarci di mahkeme pêşîn de hatin berdan û wê ji derve bîn mahkeme kirin. 6 Parlamenterên din piştî 15 rojên nezaretê di 17'ê Adarê de ji aliyê Mahkeme Dewletê ya Ewleyî (DGM) ya Anqerê ve hatin girtin.

Mahkema Qanûna Bingeîn ya Tirkîyê di 21'ê Adarê de bersiva muracata DEP'ê da û rakirina immuniteta parlamenterên DEP'ê ji aliyê Meclîsê ve tesdîq kir. Ji bo ku protestoyên Ewrûpiyan nerm bike tenê immuniteta Parlamenterê DEP'ê yê Şirnexê Selim Sadak iptal kir.


6 Parlamenterên DEP'ê û Mahmûd Alinak bi sûtê "ihaneta welat" tî sêdarkerin û Hasan Mazarci jî ber heqareta li Ataturkê tê mahkemekirin. Ev Parlamenter di xala 125'an ya Qanûna Cezayî de wê bîn meheme kirin ku cezayê dardekirinê jî di vî xalê de ye.

Ev qerar ji aliyê gelek hêz û mûsesên demokratîk û humanîst

Dûmahîk: r.11



Selim Sadak



Hasan Mazarci

Rojava Mehê

Sedemê rewşa îro ne krîza iktîsadî lê ya siyasî ye

Li Tirkîyê di 27'ê Adarê de hilbijartinên herêmî çêbûn û pişt re jî hukûmeta dubaskîn pakêta tedbirên iktîsadî vekir. Bi vê pakêta re qiymeta perê Tirkîyê bi heddek mezin ket û buhayî nêzî du qatan zêde bû, zam hat ser buhayê hema hema hemû tiştan.

Li ser hilbijartin û encamên wê û li ser pakêta tedbirên iktîsadî ya hukûmeta rast û çep gelek munaqeshe tîn kirin; him encamên hilbijartinan him jî yên pakêta şekek mezin li nav xelkê peyda kiriye pêlên meş û miting û grev û protestoyan her ku diçe berfirehtir dibin. Herkes jî aliyekî de bi awayekî li gorî berjewendiyên xwe û li gorî tesîra ku li serê çêdibe birûbaweriyên xwe şirove dike. Lê xwiya ye di navbera van hemû bir û baweriyên de xaleka muşterek heye ku ew sedemê rewşa îroyîn di krîza aborî de dibînin. Kêm caran behsa krîza siyasî tê kirin û yên ku dikin jî wê di derca duduyan de û wek netîca krîza aborî dibînin. Ev tespît muşterekiya xwedan bir û baweriyên rast e jî û ya çep e jî.

Di hilbijartinên herêmî de yên ku herî bi paş de ketin û zerar dîtin Kurd bûn. Bilindbûna rayên Refahê jî di dema pêşiya me de wê bibe bûyereke welê ku, hukûmetên Awrûpî û yên Amerikayê pirtir alîkariya, partiyên ser hukum ên Tirkîyeyê bikin, tawîza bidin wan, li hemberî êrişên wan ên ser Kurdan bêdeng bimînin.

Lê gava mirov bala xwe dide tarîxa van salên dawîn ên Tirkîyê û rastiya îroyîn, xwiya dibe ku rastî tam vaciya van tespîtên han e. Ya ku Tirkîyê xistiye vî halê îroyîn ne iktîsad e lê rewşa siyasî ya Tirkîyê ye. Ne ku aboriya Tirkîyê ne di krîzê de ye lê krîza wê bi xwe jî encama krîza siyasî ye.

Carekê, li Tirkîyê bi rast û çepên xwe û bi Kurd û Tirkên xwe, siyaseta perçe û ber belav e, partiya herî mezin xwedanê ji sedî 21-22'yê dangan e. Siyaset li Tirkîyê jî îstîkharê, xurtehiyê û ji serokatîyê bêpar e. Piştî mirîna Turgut Ozalî, bi maneya xwe ya "anaberkiyê" be jî serokatîyeka xurt a mîrxas a bi kêrhatî ku karibe welat ber bi reformên siyasî, civakî û aborî de bibe nema ye. Serokên partiyên îroyîn, ji çareserkirina pirs û pirsgerêkên giran ên Tirkîyê bêtir bi xwenasandin û dem qebûlkirina xwe bi ordiyê û muesesên "hassas" ên dewletê mijûl in, ketine he-wildana îsbatkirina ruşda xwe. Evê yekê jî leceke çavgirtî û bêberhem di navbera partiyên de peyde kiriye ku nahêle berê wan têkeve çareserkirina pirsên esasîn. Her evê yekê, ruşwetxwarî, talankarî û îstîsmara dewletê jî alî siyasîyan û burokrat ên giregir jî ji her demê firehtir kiriye, baweriyaya civakê jî siyaseta û siyasetmedaran şikandiye. Di siyaseta de dejenerasyon û bêmoraliyeka bêhed serî hildaye.

Serokên siyasî yên nuhati jî ber bêehliyê û bêspatiya ruşda xwe, ji yên berî xwe bêtir bêinsiyatîf in û di meselên demokratîkbûnê de bi taybetî jî di mesela çareserkirina pirsê Kurdî de hevsar di destê hêzên

Dûmahik: r.11



3 alîgirên PKK'ê li Almanyayê xwe şewitandin. Ronahî (li milê çepê) û Bêrivan

Newroz bi pêtên keçan gurr bû

Di bin siya leşker û tima xusûsî de îsal li Kurdistanê Newroz hat pîrozkirin. Gelê Kurd dîsa agirê Newrozê vêxist û govend li dar xist. Li Cizîrê û Şîrnexê polis û "mîlîsên gund" bi alaya Tirkî Newroz pîroz kirin. Li Diyarbakirê li heremên Baxlax, Mergahmedê, Şehîtlîxê û Yenîşehrê xelkê agirê Newrozê vêxist û li dor agir reqîşin.

Li Edenê, Mersînê, Anqerê, Stenbolê, İzmirê, İzmirê û gelek bajarên din yên ku Kurd lê hene Newroz jî aliyê DEP'ê ve bi şev û şahiyên hat pîrozkirin bi taybetî jî li bajarê Adenê gelek kes beşdarî pîrozkirina Newrozê bûn û 200 kes jî aliyê polis ve hatin girtin.

Ji bo pîrozkirina Newrozê di cî de bibînin bi sedan parlamentê û rojnamevanên Ewrûpî çûn Tirkîyê û Kurdistanê.

Lê tiştê balêş ew bû ku îsal PKK'ê belavok derxist ku xelk li mala xwe Newrozê pîroz bike. Berê jî ji tîrsa dewletê kes nikaribû jî malên xwe derkevin.

Newroz dibe cejna resmî

Ev du sal e ku berdevkên hukûmetê û partiyên Tirkîyê dibêjin Newroz ya Tirkan e jî û bi salan e li Kafkasyayê tete pîrozkirin. Û ew bi munasebata Newrozê êdî beyanan jî derdixin. Serokwezîra Tirkîyê Tansû Çiller got: "saleke din ewê Newroz bi resmî bikin cejn."

Lê Armanca dewletê û hukûmeta Tirkîyê ew e ku bi resmîkirina cejna Newrozê, wê ji manaya wê ya pîroz dîr bixin û maneyeka din bidinê û bikin wek roja hatina biharê. Lê dewlet di vir de gelek dereng ma ew êdî çî bikin bila bikin ew nikarin agirê Newrozê yên azadî û rizgariyê jî mijûl û dilê gelê Kurd derxînin.

Dewleta Sûriyê jî ji ber ku nikaribû pêşî lê bigre û nehêlê Kurdên bin xetê Newroz pîroz bikin, roja Newrozê kiribûn "Roja dayikan".

PKK'ê Almanya ser û bin kir

Kurdên Ewrûpayê jî zilm û zora dewletên dagirker dîr li biyanîyê Newrozê bi şevan pîroz dikin. Li Almanyayê HEVKAR, KOMKAR di salonên mezin de bi beşdarbûna hezaran kesan bi muzîk û stranên Newroz pîroz kirin.

Li Fransayê Komeleya Çandî ya Kurd û Fransîz di 19'ê Adarê de li Parisê bi şeveke Newroz pîroz kir.

Lê îsal li Almanyayê alîgirên PKK'ê bi munasebata Newrozê meş û miting amade kirin, rêyên trafikên di navbera bajarê Mûnih û Stuttgartê "işgal" kirin, vagonên trenan şewitandin. Tevgerên PKK'ê bi rojan dom kirin. Li Frankfurtê 3 alîgirên PKK'ê benzîna rijandin ser xwe û xwe şewitandin, ji wan du kes mirin.

Li Berlînê, li Aushûrgê, li Wiesbadenê di navbera alîgirên PKK'ê û polisê Almanyayê de şer derket. 80 polisên Alman hatin birîndar kirin û nêzî 2000 alîgirên PKK'ê hatin girtin û ji wan 17 kes avêtin hefsê.

Hukûmeta Almanyayê reaksiyoneke mezin nîşanê van bûyaran da. Wezîrê Hundîrîn yê Almanyaya Federal Manfred Kanther got ku; kesên ku bi kevir û bombeyên kokteyl êriş dibin ser polisên me, wagonên trenan didin ber agir, riyên me "işgal" dikin lazim e ne tenê bi hefs û cezeyên peryan bimînin ew kes jî welatê me jî bî avêtin."

Serokwezîrê Almanyayê Helmut Kohl jî got ku "kesên huzûra civata me xerab dikin, wê welatê me terk bikin".

Berdevkên hukûmeta Almanyayê dibêjin ger ku Tirkîyê wan îdam neke û îşkence bi wan neke emê van alîgirên PKK'ê teslîmê Tirkîyê bikin."

Li gor alîgirên PKK'ê, polisê Almanyayê rê nedaye ku Newroz bê pîroz kirin

Lê ev daxwazên adil bi tevgerên wilo tîn çêkirin ku ji karê zêdetir zera dide pîrsa Kurdî. Sempatiya ku gelê Ewrûpayê û Almanyayê jî gelê Kurd heye ji holê radike û sempatiyê dike anti-patiyê. Hele hele dema ku Tirkîyê tevgera PKK'ê di nezda Ewrûpiyan de wek tevgera "terorîst" nîşan dide PKK'ê jî bi kirinên xwe hîzmeta wê yekê dike ku gotinên hukûmeta Tirkîyê di derheqê xwe de rast derdixîne..

Du keçan xwe şewitandin

Agirê Newrozê bi pêtên keçan bedew tê xemilandin. Piştî Zekiya û Raşan di Newroza îsal de jî Ronahî (Bedriye Taş) û Bêrivan (Nîlgün Yildirim) li Al-

manyayê bajarê Mannheim benzîna rijandin ser xwe û xwe şewitandin. Di tev gera rizgariya Kurdistanê de şewitandina keçên Kurdan feno-meneke nuh e. Pêwîst e meriv li ser vê yekê bisekine.

Swêd

Li Swêdê êdî bûye tradîsyon ku Federasyona Komeleyên Kurdistanê Newroz pîroz bike. Newroza îsal bi beşdarbûna 3 hezar kes hat pîrozkirin. Tahsîn Taha, Nizamettîn Arîç, Fuad Ahmet, Nasir Rezazî û Seid Yûsuf wek hozan beşdarî şevê bûn. Serokê duym Ahmed Karamûs li ser navê Federasyonê û Seroka Komîte Swedî jî bo Mafê Kurdan Ingella Martensson axaftin. Dosta Kurdan û Parlamentera Partiya Çep Berit Eriksson axaft. Samî Abdurrahman jî di şevê de hazir bû li ser rewşa Kurdistanê azad axaftinek kir.

Beyana sê rêxistinên Kurdistanê

YEKBÛN, RNK-KUK û TSK li ser Newrozê beyaneke muşterek derxistin. Di beyanê de bi kurtî wiha tê gotin. "Rêxistinên me (RNK/KUK, TSK û YEKBÛN) ji bo yekîtiya siyasî ya li ser zemînekî sosyalîst ku bikaribe bi awakî xurttir mudaxelayî pêvajoyê bike, hatin ba hevdu û di vî warî de hinek gavên girîng avêtine. Bi munasebata cejna me ya neteweyî; Newrozê, em gazî hemû hêzên welatparêz û gelê xwe dikin.....Li hemberî vî şerê hov û bêsinor çeka me ya herî mezin, di her warî de pêkanîna yekîtiya neteweyî û hevkarîyên me ne. Eger em bixwazin weke neteweyekî hebûna xwe biparêzin, li hemberî vî şerê berfireh, bi rûmet li ber xwe bidin, serxwebûn û azadiya xwe bi dest xînin, divê em yekîtiya xwe ya neteweyî geştir bikin; di her sewiye û waran de di nava yekîtiyê û hevkarîyan de bin. Ji dervayî vî rêyê, rêyeka din tuneye. Ji ber vê yekê, rêxistinên me careke din di din diyar kirin ku divê xebatên eniyê yên di nava hêzên welatparêz û şoreşger de berdewam in, di demeke herî nêzik de bighêjin encamê û têkevin jiyane."

Ji aliyê din Komîteya Navendî ya Partiya Yekîtiya Kurdên Sûriyê jî ji bo Newrozê nemeyeke taybetî weşand.

Robîn M.

Armanç

Rojname Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktorê berpirsiyar:** M. Elî, **Berpirsiyarê beşê Dimilkî:** Malmîsanîj, **Berpirsiyarê rûpelên edebî:** Ehmed Huseynî
Utges av: Kurdîska Demokratîska Arbetarunionen
Abonetî/Prenumeration: Abonetîya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewrûpa: 50 DM. Li derveyî Ewrûpa: 40 \$,
Anons/ilan: niv rûpel/en halvsidan 2500 SKR
Telefon: 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:** 50 37 99-9
Adres: Box: 152 16
 161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Cejna te pîroz be ey Welat!

Ey welatê ku anuha li ser devê sinoran û li ser tenhaya pencereyên girtixaneyan û li ser kêlên goristanên dilovan, hatiye reşandin...

Ey Newroza ku anuha di dilê mirovan de mîna posterên şehîdan û mîna kulîlikên bejî dibişkive...

Te peyv û nameyên me di dûkela xwe de hiştin ey NEWROZ!..Te bêrikirina dost û hevalan li ser lerza dengên me hiştiye. Tu ligel baranê pevçûna xwe berdewam dikî..

Agirê te gurr dibû û şehîdên te bêyî xatirwestin berê xwe didan govenda dirindane, kulîkine sipî li ser kiras ûxeftanên jinên xwe dihiştin û diçûn. Agirê xemgîn çiya bi çiya dihat û di dorava çavên wan de rast dest dibû.

Ey Kawa yê Kewkar!!

De wê roja xwe î nû zelaltir bike!

De Helebçe û gaza Xerdele, de Amedê û Botan, de Mehabad û Qamişloke ze-

laltir bike!

De ewan xelkên bêdeng ên ku li bin sîbera navê. Te rawestiyî ne zelaltir bike û ji qebqeba kewên destê xwe navekî pêşkêşî wan bike! Navêkî ji destpêka elenda xwe hetanî şeva bindestî û kuştin û talanê..

Ey welatê bêcir û serhişk!!

Ey dilê ku bi aleke qedexa dijene, ku bi pêjna sirûdan sermest dibe û dibêje:

Ha wa xoşewîst hatin...Hatîn û bihara niştiman li ser lingên wan pêldide û sala nuh ji nav mistên wan ber bi azadiyê ve dadikeve...subê dê evîndar hîni gulçinîne bibin, dê kulîkên bejî di asoya Newrozê de bibarin, dê reşgirêdana dayikan di toza qonaxê de fêrî aram ûkeservedanê bibe...

Saleke nû ye ey NEWROZ!

Û temenê çiyân di navbera zemîn û tembûra şikestî û çirên vemirtî yê girtixaneyan de derbas dibe..

Kê dilê me hîni cegerdariyê kiriye ku wisa alên xwe li ser keviya her çar aliyan bilind

bike..ku wisa Kurd hêsa xwe di navbera gaz û gullan de, taristan û zemîna baranperest de bibarînin..

Kê ev Newroz wisa ronak kiriye:

Ku, bi agirperestî, bi germî, bi serbilindî, mîna balendeyekî di bêhna "KAWA" de digere..

Deşt û çiya û şehîdên bê wesiyetname ey NEWROZ!!

Êş û derd û bapir ey NEWROZ!

Çoristanên ku di nav biyanîyan de wendabûne ey NEWROZ!

Û hêlana ku di navbera dagirkeran de wenda bûye ey NEWROZ!

Herê..Herê ey NEWROZ

Kê tu wisa hîn kiriyî, kê te wisa şêrîn kiriyî..Kê tu wisa dîn kiriyî..

Tu berê xwe didî dilê Kurdistanê...Û dema ku tu digîhêji asîtankên çiyân xwîn diqire û dibêje:

NEWROZ e.. li ser nijada KAWAYê kewperest hatiye reşandin..

Armanc

Neynik

Nêrînek li ser rewşa Kurdistanê

S. Esmer

Demek berê ez çûm Kurdistanê ew çend sal bûn ku ez neçûbûm. Ez li gelek herêmên Kurdistanê geriyam û kesên ku ez bi wan re peyivim ji aliyê welathizî û siyasî ve ji 15 sal berê qelstir û zehiftir bûn. Yanî 15 sal berê rêxistinên rizgarîxwaz yê Kurdistanê dikaribûn biçûyana her gundekî Kurdistanê ji bo alikariyê. Lê mixabin îro ne wiha ye. Hemû rêxistinên Kurd -PKK jî di nav de- nikarin herin gundan. Gundê ku diçinê jî dotira rojê êrişê dijmin li ser e û tu kes nikare wan gundiyan biparêze.

Min koça xelkê bi çavên xwe dît. Dewleta Tirk pir bi êşkere dixwaze Kurdistanê vala bike. Êrişên ordiya Tirk ji aliyekî û êrişên PKK'ê ji aliyekî gundiyan Kurdan bê çare dihêle. Gundî çareyê di koçkirinê de dibînin. Di vî warî de rewşa Kurdistanê Başûr jî tirsek mezin xistiye dilê dewleta Tirk. Haya wê ji pîlanên navnetewî heye û ew dizane ku dinya wê tîrsa Kurdistanê Başûr çareser bike. Di vî warî de bi bawerîya min du alternatîf hene; yan çar milyon Kurdên Kurdistanê başûr dê bibin xwedî statûyek yan jî rê wê ji Seddam re bête vekirin. Ya duyemîn bi ya min gelek zehif e.

Lê tiştê heye divê em binê wê xet bikin ku dewleta Tirk di politîka xwe de bi serketiye. Berî salekî ew dewletên ku dixwestin ambargoya çekan li dijî Tirkîyê îlan bikin, îro piştigiriya dewleta Tirkîyê dikin. Her çendî feyda wan weha dixwaze jî lê rola hin çewtî û şaşiyên PKK'ê jî di vî tiştî de xurt e. Eger em wek Kurd vî yekê nebin û qebûl nekin divê wê demê em kirinên PKK'ê li Kurdistanê Başûr jî di cî de bibînin. Bi ya min ev ne rast e.

Pîrsa "Qorucûyan" bi serê xwe problemeke mezin e. Sedemên kesên ku gundparêzî qebûl dikin pir in. Lê tu şik tûneye ku di peydekirina "Korucûyan gundan" de rola dewletê çiqas negatîf be, ya PKK ê jî hewqas negatîf e. Bi ya min afirandina "gundparêzan" neûca siyasîyê şaş ên rêxistinên Kurdan e. Di siyaseta xwe de rêxistinên me faktora civakî ya gelê Kurd ne anîne ber çavan, baş lê hûr nebûne. PKK bi armanca xwe ya ji holê rakirina "gundparêzan" beşek ji gelê Kurd jî xistiye nav hedefên xwe. Bi ya min ne hewce ye ku "gundparêz" bibin hedefa rêxistinên rizgarîxwaz. Ji bo me mînaka herî baş li ber çav Kurdistanê başûr e. Wek tê zanîn li Kurdistanê Başûr ên li dijî şoreşê bi sed hezaran bûn. Dema ku ordiya Îraqê êrişê dibir ser pêşmergan, bi deh hezaran ceşî jî pê re bûn. Lê rêxistinên Kurdistanê Başûr ew gundiyan ceşî wek metod ji xwe re nekirin dijmin. Kuştina wan û zar û zêçên wan nedan ber xwe. Ev yek di roja teng de çîqa kêrî Kurdan hat me dît. Piştî şerê Xeliçê, dema Seddam şikest, Şî'ya li başûr û Kurdan jî li bakur serî hildan. Wan Kurdên ku bi navên ceşan hatibûn bi navkirinê berî Cephê Kurdistanê û berê hêzên siyasî dest avêtin malê dewlet; tanq, top û îstîxbarata Îraqê dîl girtin û teslîmî hêzên Kurd kirin. Îro jî ji bo avakirina Kurdistanê dixebitin. Divê em Kurdên Kurdistanê bakur jî di vî warî de xwedî politîka bin. Heya niha kuştina gundparêzan û zar û zêçên wan tu feyde nedaye tevgera gelê Kurd.

Ez dixwazim careke din vegerim ser pîrsa koçkirinê. Îro koçkirina ku li Kurdistanê heye tu caran çenebûye. Sedemên koçkirinê jî wek herkes dizane bêrêxistinî ye. Ji xwe PKK'ê jî bilî xwe hemû rêxistinên siyasî yê Kurd "hevkarên dijmin" îlan kiriye û meydan ji wan re nehîştîye, ji bo vî yekê her metod bikar aniye. Îcar PKK ê bi xwe jî nikare vî koçkirinê bide rawestandî, ji ber ku tu bawerî nedaye xelkê. Tu hêzek din jî ku bikaribe gel himbêz bike tune. Kurdên welatparêz ne dibin "gundparêz" û ne jî li gel PKK'ê ne, çare di koçkirinê de dibînin. Koçkirin her berdewam e. Ew kesên ku koç dikin hem welatparêz in û him jî yê zana ne. Sermiyandarên Kurdistanê jî ji ber tevheviyê û dahatuya xwe ya bê ewle terka welatê xwe dikin. Sermiyarên xwe jî bi xwe re dibin û dixin bin xizmeta miletekî din. Ev yek zirareke pir mezin digîhîne tevgera gelê Kurd. Lê sed heyf û mixabin ku îro MHP ê jî bilî Dêrik û Stewrê li Mêrdîne roj bi roj xurtir dibe.

Herçiqas îro karek ji bo cephekê hebe jî PKK e bi resmî mora xiyane û hevkarîyê tu hêzê ranekirîye. Di van rojên ku xebat ji bo cephekê heye pêwîst e em van meselan munaqêşe bikin. Diyar e; bingeha tevgera gelê Kurd hatiye dînamîtkirinê. Şertên xebata siyasî li Kurdistanê pir dijwar bûne. Divê em bala xwe baş bidinê ku ter û hişk bi hev re nedin şewitandinê. Ji Cephê zêdetir em bikaribin bibin dost û em bikaribin siyasetekê deynin ku me bîne cem hev.

Pîrseke din ku bi ya min pir girîng e pîrsa huqûq û edaletê ye. Em Kurd divê qanûnê medenî yê dinê qebûl bikin. Wek tê zanîn di temamî qanûnan de û di qanûna dewleta Tirk a kolonyalîst de jî ew kesên emrê xwe di bin 18 an de ye ne xwedî dengdayîne ne, di dadgehê de şahidiya wan nayê qebûlkirin, naçin eskeriyê. Kesên ku di şerê çekdariyê de cihê xwe distînin di bin 18 salî re ne. Ev kategoriya han li welatê me çawa dikare di wan meselên giran de bibe xwedî biryar?

Gelê Kurd îro wek berê alikariyê nade welatparêzan. Tirseke kûr ketiye dilê gelê Kurd. Ya herî xirab ew e ku tîrsa PKK'ê û tîrsa dewletê gihîştine hevûdu, gel tu ferq naxe navbera wan. Zulmîrîn, zarok û jin û pîr kuştin divê ne karê me be. Kurdên ku ji cendîrman zalimtir bin, edeleta wan ji ya dijmin kêmtir be, hîç kêrî xelkê me nayên.

Berzanî hat bi bîr anîn

Li Stokholmê, di 5'ê meha Adarê de ji bona 15'ê saliya koçkirina serokê nemir Berzanî civînek mezin hat li dar xistin... Civîn ji layê Komîta Hevkarî ya Hêzên Siyasî yê Kurd û Kurdistanê ve hate amade kirin. Li ser navê Komîta Hevkarî Bûroya Kurdistanê û ji Partiya Sosyal Demokratîk sekreterê alaquetên derve axaftin hatin kirin û di tekoşina gelê Kurd de rola serok Berzanî hate nîşandan... Sekreterê alaquetên derve yê Sosyal Demokratîk, di axaftina xwe de da diyarkirin ku, gelê Kurd di bin gelek zîlim û zorê de ye û divê hemû mafên wan î demokratîk bêne dayin, û her weha helwesta hukûmeta Tirk ya li himber Parlemerterê DEP'ê tawan bar kir...

Helebçe hat bîranîn

Komîta Hevkarî ya Hêzên Siyasî li Swêdê îsal di 16 meha Adarê de bi mitîngêkê helebçe bi bîr anî. Di mitîngê de, ji Partiya Swêdê ya çep, Parlemertera dosta Kurda Berit Eriksan axaftinek kir. Di axaftina xwe de Eriksan, got ku "Her çend bi peymanên navnetewî xebitandina çekên kimyayî hatibû qedexekirin ji, dîsa dinya gelek bê deng ma wexta hukûmeta Irak li hember gelê Kurd ev qatîam kir. Her wusa Parlemertera hêja gelek nerazîbuna xwe da diyarkirin ku, Hukûmeta Tirkîyê 6 Parlemanterên DEP girtine û dixwazin rêyên demokratîk li hember gelê Kurd bigrin.

Her wiha li ser navê Komîta Hevkar, li ser navê Bûroya Hukûmeta Kurdistanê û li ser navê Federesyona Komelên Kurdistanê axaftin hatin kirin.. Helebçe careke di hat bi bîr anîn û daxwaz hata kirin ku çareyek demokratîk ji bo pîrsa gelê Kurd bête dîtin...

Dengê ji rojavayê Kurdistanê

Terora Dewleta Tirk, di mehên dawî de, her çûye bêhtir û berfirehtir bûye. Mirov pêna guhartinên demokratîk û bayê demokrasîya, ku ev çend sal in bi ser cîhanê de hilhatine, hîç nake. Valakirin û şewitandina gundan, koçbarkirina kesên sivil yê bêguneh, kuştinên "kiyar nediyar", girtinên deriyasa yê perlemanterên Kurd- û hwd, tenê xelekek in ji zincîra tawan û terorê; zincîra şovenîzma ku, ji siyaseta TC re bûye bingeh.

Li dijî van kiryarên nemirovane û şoven, di 26. 02. 94'an de û bi pêşniyarîya sê endamên Kurd di parlemana Sûriyê de, 35 endamên perlemana Sûriyê nameyek rûreşkirinê ji serokkomarê Tirkîyê, serokê encûmena niştîmaniya Tirkî ya mezin û serokwezîra Tirkîyê re, li ser siyaseta û kiryarên şoven yê hukûmeta Tirkîyê beramberî gelê Kurd, şandin.

Parlemanterên birêz ji berpirsiyarên Tirk daxwaza çareserkirina doza Kurdî bi metodên aştiyane û destberdana ji metodên leşkerî û zorbetiyê, kirine.

Di nameyê de tê gotin: "... Kiryarên leşkerî û siyaseta

şoven a hukûmeta Tirkîyê dibê sedemê encamin sawdar ji bo gelê Kurd, ku ew jî dibe sedema xemxwarî û dilnexweşiya me û hemû mirovên azadîxwaz û dadmendparêz. Lewa ev kiryar li dijî prensîpên demokrasîyê û mafê mirovan in, ku berpirsiyarên Tirk bixwe ji rêzdarî û giramiya xwe jê re, xwadenegiravî, diyar dikin (...)

Serpêhatiyên gelan, û a Tirkîyê bixwe jî, êşkere û zelal kirine ku, ev reng siyaseta bêsûd û encam e. Lew doza gelan tenê bi riya hevpeyvîna aştiyane li ser bingeha venasîna mafên netewî ji gelên bindest re, tete çareserkirin."

Di dawîya nameyê de ji hukûmeta TC tete xwastin: "Em, jiber win berpirsiyar in, rawestandina kiryarên serane û karkirina jibo çareserkirina aştiyane û dadmend ji doza gelê Kurd re, ji we dixwazin(...)

Sê perlemanterên ku ev rûreşkirina pêşniyar kirine ev in: Fuad Alîto, Kemal Derwêş û Hemîd Derwêş ku ew nûnerên Tevgera Rizgarîxwaza Kurd li Sûriyê ne.

Kamîran Bêkes /Afrîn

Daxuyanî

Ji ber buhabûna posteyê em jî mecbûr bûn ku buhayê û heqê abonetiya Armancê zêde bikin

Redaksiyon

Encamên Hilbijartinê

Halim Can

Hilbijartina herêmi ya Tirkîyê di demeke wiha de çêbû ku li Tirkîyê krîza aboriyê hebû û êrişên li dijî DEP'ê û bi tevayî li dijî gelê Kurd gihastibû qonaxêke bilind. Partiya ku hukûmetê îdare dikir di sê salên dawiyê de qîmeta Lîrayê Tirkîyê çarçûr kiribû û bûbû sebeb ku aboriya Tirkîyê bigihîje vê noqtê, lê dîsa jî ji aliyê gelê Tirkîyê ve ew di hilbijartinê de bû yekem. Tansu Çiller wek seroka DYP û serokwezîra Tirkîyê di kampanya propagandaya hilbijartinê de temayek tenê bi kar anî. Ew jî ev bû ku digot; "Me siya PKK'ê li ser Meclîsê rakir û immuniteta DEP'îyan rakir", "Me Ewrûpî îqna kirin ku ew jî PKK'ê wek rêxistineke 'terorîst' bibînin", "Me PKK'ê li Zelê, li Hekariyê, li Agriyê pelçiqand", "Her dengê ku hûn bidin DYP'ê, wê bibe gulle li hember PKK'ê" û h.w.d. Netîcên hilbijartinê diyar dîke ku gelê Tirkîyê bi van kirinên hukûmetê re hemfikir in, ew birçî bin, tazî bin, rewşa wan yê aborî çiqas nexweşbe jî, şowenizma wan, nasyonelizma wan her tim pêl dide.

Wek hemû hilbijartinên ku heta nuha di dîroka cumhuriyê de çêbûne ev hilbijartin jî ji bo gelê Kurd antî demokratîk bû. Gelê Kurd di bin siya çekan de, bê partî û rêxistinên xwe mecbûrî hilbijartinê bû. Ferqa vê hilbijartinê jî yê din ew bû ku, xwedêgiravî herçiqas ne bi navê partiya Kurdan bûna jî, partiyek hebû û di raya Kurdan û cîhanê de wek partiyeke Kurdan dihat nasîn, ew jî DEP bû. Lê êrişên dewletê li dijî wê, namzêten û avahiyên wê Meclîsa DEP'ê 'mebûr' kir ku ew xwe jî hilbijartinê vekşînin. Halbûkî serokê DEP'ê Hatip Dicle digot ku; "Di çî şertî de dibe bila bibe, emê dîsa bikevin hilbijartinê". Lê partî piştî ku namzêten xwe yê belediyan îlan kirin, piştî çend rojan Meclîsa DEP'ê bi piranî qerar stend ku ji hilbijartinê vekşînin. Ev qerar, qerarek terefek jî partiyê bû û ev teref jî di Meclîsa Partiyê de piraniyê teşkil dikir. Lê êdî wext dereng bû, yan jî terefên din ku li hember vê qerara Meclîsa DEP'ê bûn, tenê bi belavokan vê helwesta DEP'ê qebûl nekirin. Herî

hindik ew karibûn bi namzêten serbixwe beşdarê hilbijartinê bibûna. Lê ew tenê got; "boykotkirina hilbijartinê ne rêye, ku namzêten serbixwe û welatparêz hebin, em reyên xwe bidin wan ku tunebin em herin ser sandokan lê reyên vala bidin." Lê di netîca de, ne tehdîten dewletê ne jî yê PKK'ê û ne jî helwestên rêxistinên din bi ser neket û meydan ji partiyên dewletê re ma û piraniya xelkê çûn ser sandokan. Dengên ku bi taybetî li Diyarbekirê vala derketin jî di pratîkê de pirr tiştan îfade nekir.

Halbûkî wexta PKK'ê qerara qedexekirina partiyên dewletê û pressa dewletê li Kurdistanê da û bûyerên ku pişt re rû dan di raya giştî ya Kurdan de atmosfereke wiha peyde kir ku êdî rêya referandûmeke li Kurdistanê vebûye û ev hilbijartinên herêmi di vî warî de gavek e. Jixwe jî ber siyaseta dewletê ya hovane demografiya Kurdistanê ser û bin bûbû û Kurd ancax karibûn tenê li Kurdistanê bi hilbijartinên herêmi bibin hukûm. Bi xwe Ewrûpî jî bi vî çavî li hilbijartinên 27'ê Adarê dinêriya û Parlamantoya Ewrûpayê qerar stendibû ku heyeteke bişîne Kurdistanê Tirkîyê û hilbijartinan di cî de teftîş bike. DEP jî ji xwe jî Ewrûpiyan daxwaz kiribû ku di dema hilbijartinê de heyeteke bişînin Tirkîyê û berdevkên Tirkîyê li ser vê gelek aciz bûbûn. Lê piştî veqî-şandina DEP'ê ji hilbijartinê Ewrûpî jî vê qerara xwe paşde stendin û hewce nedîtin ku heyata xwe bişînin Tirkîyê.

Netîca hilbijartinê jî nîşan da ku qerara DEP'ê ya xwe vekîşandina ji hilbijartina ne li gor berjewendiyên gelê Kurd bû, ne tehdîten PKK'ê, ne jî helwestên partiyên din netîceyeke pozîtîv neda, xelkê Kurd piranî çûn ser sandokan û reyên xwe dan partiyên dewletê.

Sebabên xurtbûna Refahê

Partiya Refahê herçiqas piranî li Kurdistanê be jî li tevayiyê Tirkîyê reyên xwe zêde kir û 13 bajarên Kurdistanê de û 12 bajarên Tirkîyê de Stenbol û Anqere jî têde seroktiya belediyê bi dest xist. Li Kurdistanê bi taybetî bajarên wek; Sêwas, Mereş, Elazîg, Erzincan ku şerê snnûti û elevîtiyê, Tirkîti û Kurdîtiyê heye Partiya faşîst ya

MHP'ê û ya Îslamî RP'ê berê jî li van bajarên xurt bûn. Lê di vê hilbijartinê de li Diyarbekirê, li Mêrdînê, li Sêrtê û li Wanê (teví qezayên wan) partiya Refahê û partiyên din yê dewletê ji valahiya DEP'ê û bi reyên DEP'ê qezenc kirin. Ji aliyê din di raya giştî ya Kurdan de Partiya Refahê li dijî Kemalîzmê tê dîtin û di eslê xwe de jî wiha ye. Lê Refah di propagandaya hilbijartinê de ne li ser milletbûnê li ser ummetbûnê sekinî, xwe wek partiyeke li dijî kedxariyê nîşan da, wek partiyeke antî-împeryalist û antî-faşîst xwe lanse kir. Gotina "duzena adil" kir bîngeha propagandaya hilbijartinê. Ev hemû bûn sebeb ku Refahê li Kurdistanê û ev bajarên ku min li jor navê wan da, qezenc bike. Yan Refahê tucarî li Diyarbekirê seroktiya belediyê qezenc nekiriye.

Ji aliyê din li Kurdistanê jî partiyên zêdetir rola namzetan girîng in. Şîrnex di vî warî de nimuneyeke ber biçav e. Serokê "Koruciyên" yê Şernaxê Beşîr Tatar di lista ANAP'ê de qezenc kir û ku ew namzetiya xwe di listeya IP (Îşçi Partîsî) de jî nîşan bida wê dîsa qezenc bikira.

Li Cizîrê, Şîrnexê, Midyatê, Dargeçîtê û Guçlukonaxê dewlet êskere piştgiyaya namzêten "Koruciyên Gundan" kir û wan da qezenc kirin.

Lê ya girîng ew e ku vê hilbijartinê nîşan da ku partî û rêxistinên Kurdan di nav gel de gelek zeif in û tesîra wan li ser gelê Kurd kême. Li Diyarbekirê tevgera rizgariya Kurdistanê ya îroyin jî ya 79'an qelstir e. Demografiya Kurdistanê ser û bin bûye. Struktûra civata Kurd hatiye guherandin, pêşketina civakî ya Kurdistanê jî ya Tirkîyê paşdetir e. Ji bo wê jî em hemû kumên xwe deynin ber xwe û careke din di serî de bifikirin.

Xeterêke din îro li Kurdistanê Bakur hêdî hêdî peyde dibe ku ew jî ev e, ez ditirsim, rewşa wê, wek rewşa Kurdistanê Iraqê ya berê salên 90'î bibe. Kurdistan bikeve destê "koruciyên gundan", gerilla li serê çiya bimîne û rola wê di civata Kurd de êdî wenda bibe. Gelo çirûskên vê xeteriyê jî we re jî nexwiyan in?

Stiriyên me

Zinarê Xamo

Suyarê hespê xelkê tim peya ye

Di sala 1989'an de li Swêdê li dora sîh (30) nivîskarên Kurda hatin ba hev û Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêd (YNKS) ava kirin. Di kongra yekem de hemû nûneran bi şewq û heyecaneke mezin li vê teşebûsê dinêrin û dixwestin "Yejîtî" rojekê berî rojekê bê avakirin.

Hejmara nivîskarên Kurd li Swêd helbet ne hewqas bûn, gelek nivîskarên din jî hebûn ku ji ber sebebên cihê cihê nikanbûn di vê kongra yekem de hazir bibûna. Lê gelek mesaj şandibûn (çî bi devikî û çî jî bi nivîskî) kongrê. Di mesajên xwe de wan jî avakirina YNKS'ê gaveke gelek hêja û biryareke di cî de didîtin.

Lê îro "YNKS" tuneye. Tuneye, çimkî endamên wê di kongra şeşemîn de (20.3.94) ew fesh kirin.

YNKS bi sîh kesî hatibû damezirandin, lê bi heşt kesan hate belavkirin. Li gel ku di nav van şeş salan de li Swêd gelek nivîskarên nuh û "modern" daketin qada edebî; lê cardin jî Yekîtiyê belavbûnê xelas nebû.

Çima?

Gelo sebra nivîskarên Kurd li Swêd nehat vegeriyan welêt?

Xwendevan nedîtin lema jî dev ji nivîskariyê berdan?

Ev Yekîtiyê neccibandin rabûn yeka din ava kirin?

Na, ne ji Swêd aciz bûn û vegeriyan welêt, ne dev ji nivîskariyê berdan û ne jî yekîtiyeke din ava kirin.

Ê wê gavê bi ku de çûn?

Ez bawer dikim nuha giş endamên Yekîtiya Nivîskarên Swêd in (YNS). Û piştî ku bûn endamên "Yekîtiya Nivîskarên Swêd", helbet divê dev ji ya xwe berdin. Bi qasî ku ez dizanim zêdeyî sîh (30) Kurdî îro endamên Yekîtiya Nivîskarên Swêd in. Û hîn gelek jî bi lez kitêban dinivîsîn jî bo ku rojekê berî rojekê huwiyeta "Yekîtiya Nivîskarên Swêd" bera bêrika xwe bidin. Ez bi xwe tu çewtiyakê di vê endamaetiya wan de nabînim. Piştî ku meriv bû nivîskar pirr normal e ku meriv bibe endamê rêxistina nivîskaran jî. Wek her sinif û tebeqê endametiya sendîkayekê mafê wan e jî. Îtîraz min ne jî vê re, tenê ez dibêjim bila bibin endamê ya xwe jî. Çaxa dibe ya xelkê bi çargaviyê diherin civîn û kongreyên wan. Lê gava dor tê ser ya wan, kes naçe civîn û kongreyan. Tew gelek nivîskar hene ku gava navê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêd derbas dibe, lêva xwe hil dikin, qet tenezul nakin bibin endam jî. Ji ber ku endametiya wê, ne jî alî maddî û ne jî alî "nav û deng" ve tiştekî nade wan. Belkî difikirin ku endametiya rêxistineke wiha wê zirarê bide qariyera wan.

Meriv dikanê bipirse: "Ma endametiya "Yekîtiya Nivîskarên Kurd", rê li ber endametiya Yekîtiya Nivîskarên Swêd digirt? Na, ma wê çima bigre ku?

Ê piştî ku gelşeke wiha jî tuneye wê gavê çima wê li "ya xwe" xwedî dernakevin ku?

Bersîva vê pirsê ez bi xwe jî baş nizanim. Lê ez dibêjim, dibe ku rêvebirên YNKS'ê ne li gor dilê wan bin, bawerî û qenaceta wan ew be ku ev hevalên îro di komîta karger de ne nikanin karêkî wiha bimeşînin. Ev jî tiştekî normal û mafekî demokratîk e. Lê di rewşeke wiha de jî şêla (helwesta) rast ne ew e ku meriv ji "ya xwe" bireve. Di rewşeke wiha de, divê ya meriv kesên jêhatîr bibîne, ya jî bi xwe bibe talibê kar. Ku tiştrkî wiha jî nehatiye krin.

Ê le sebeb çî ye?

Li gor baweriya min sebeb pirr basî e: Wek millet, bi piranî yê "me", tim bi me t'al e û yê xelkê jî tim bi me şîrîn e. Em wiha fêr bûne ku tu carî "ji xwe re" nekin, tim jî xelkê re bikin, yê xwe biçûk, ne hêja û yê xelkê jî mezin û hêja bibînin. Xwe di bin xelkê re û xelkê jî di ser xwe re bigrin. Ji ber ku ferdê milletê bindest bêtir heyranê "xelkê" ye. Ev, psikolojiya xwe biçûk dîne ye. Wek millet ev jî serê sedsalan ve ye ku em bindest in. Vê bindestiyê şûrê me yê millî kuştîye, li ser ruh û qerkerê me tesîreke gelek ne baş hîştîye. Wiha kiriye ku em fêr bûne tim jî xelkê re herin nêçîrê. Helbet ev tişt bi zanîn û bi nêteke xerab nayê kirin. Lê nêta me netîca fiilê me naguhere.

Psikolojiya "heyranîya xelkê" xwe bera hinavê piraniya me daye. Em bi rehetî dikanin şûr bidin detê celadê xwe, ji bo ku serê me bifirîne. Ma heger ne ev psikolojiya malkambax ba ji bo çî îro wê bi sed hezaran Kurd jî Tirk, Ereb û Farisan re xizmet bikirana, bibana siyasêtdar, edîb û hunermendên wan milletan? Ma heger ne ev psikolojî û bê şûrî buya Kurdan wê çawan bi sed hezaran ray bidana Erbakan, Turkeş û yê wê wan?

Erê em kesên Kurdperwer ne di rewşa kesên di cepha dujmin de ne; cepha me cepha Kurda ye. Lê cardin jî em bi temamî nebûne "peyê" mala xwe. Em çî navî li xwe dikin li xwe kin, netîca li ortê ye: Ka îro çend dezgeh û muessesên me hene ku em wek millet bi wan serbilind in? Tunene. Û qet nayê bîra me ku em wan ava jî bikin. Çimkî ew kultur û şûra ku em rêxistinên wiha ava bikin û bidin jiyandin bi me re tuneye. Ku hebûya emê li ya heye xwedî derketana. Wer xuya ye emê tu carî nebin miqlaciye xwe, emê tim suyarê hespê xelkê bin. Lê suyarê hespê xelkê jî tim peya ye... □

Samî Abdurrahman:

“Nabe em bibêjin

azadiya Kurdistanana Başûr misoger bûye”

Samî Abdurrahman endamê seroktiya Herêma Kurdistanê Îraqê, endamê Bûroya Polîtîk ya PDK-Yekgirtin û endamê dezgehê bicîanîne yê Kongreya Nîştîmaniya Îraqî ya Yekgirtî (INC) ji bo seredanekê hate Swêdê. Di 19.03.94'an de di şeva ku Federasyonê bi hilkeftina Cejna Newrozê organîzekirî de peyîvî. Di 20.03.94'an de bû mewanê Federasyonê û di civîneke hevbeş ya komîteya kargêr ya Federasyonê û Komîteya Hevkarî ya Hêzên Siyasî yê Kurdistanî de beşdar bû.

Di civînê de Samî Abdurrahman li ser rewşa Kurdistanana Başûr rawestîya û got: "Nabe em bibêjin azadiya Kurdistanana Başûr misoger bûye... Xebat û şer berdeham in û bi dawî nehatine û pêwîst e her Kurdek berevanî û bergiriyê ji birayê xwe yê Kurd û piştgiyariya wî bike."

Di axaftina xwe de Kek Samî xuya kir ku, hêzên siyasî yê Kurdistanana Tirkîyê û Iranê li başûrê welêt azad xebata xwe ya siyasî û ragehandinê bi rê ve dibin û got "ji bilî yek hizbê problema me digel çî terefekî din nîne".

Wek nimûneka hevkarîya Kurdistanî bi hukumeta Herêma Kurdistanê ve qala PDK-Iranê û helwestê wan yê baş kir. Ka çawan çaxê li ser sînoran bûn ne wan û ne ji gundên ser tuxiba yê Kurdistanana Başûr çî rehetiyek nebû. Hukûmeta Herêmî ji wan xwest ku ji sinor dûr bikevin bo nav axa başûrê Kurdistanê û wan weha kir. Niha xebata xwe ya rêxistinî û ragehandinê (çandê) û heta ya çekdarî jî didomînin.

Samî Abdurrahman di axaftina xwe de got: "Divê peywendiyên di navbera hêzên siyasî û bi teybetî yê serekî yê hemû perçeyên Kurdistanê de baş û bi hevî bin." Û wî girîngiya yekgirtinê bi vî awayî dest nîşan kir û got: "eger em bi hev re bin û yekgirtî bin emê bi ser kevin û eger em yekgirtî bin û bikevin jî dê em bikaribin xwe ji ketinê rabigrin û rabine ve."

Li ser rewşa aborî ya Kurdistanê ya dijwar û şikestina Dînar û giranbûna buhayê tiştan û nexasme yê serekî axift. Kurdistan wek yek ji dewlemendtirin deverên Rojhilata Navîn dest nîşan kir. Lê, got ku, destê wan girtî ne û nikarin tişt û dezgeh û maşînen pêwîst bo çêtirîkirina rewşa aborî û damezrandina kargeh û fabrîqeyan bikirin û bibin Kurdistanana Başûr.

Wek çareserkerin ji ve pirsê re Samî Abdurrahman dixwaze ku, tevgera Kurd û INC û yê naxwazî Seddam bimîne, bo nehiştina abloqên aborî li ser Kurdistanê însiyatîvê bistînin û weha bikin ku xeta 36 berfireh bibe û bibe xeta 35. Bi wî awayî Kerkuk jî dikeve nava deverên azad û weha rewşa aborî dê çêtir bibe.

Di warê helwestî de li hember Îraqê wî got ku, "divê Îraq biryara 687 ya jinavbirina çekên qutbirker yê Îraqê bi cî bîne, lê qala hindê jî kir ku, hin dewlet hene berî niha çek firotibûn Îraqê û nuha dixwazin li şûna deynê xwe neftê ji Îraqê bistînin. Her ji bo ve mebesta xwe hewil didin abloqa aborî li ser Îraqê nemîne. Bi dîtina Samî Abdurrahmanî "Seddam mafên Kurdan erê nake û gotina wî ne cihê baweriya Kurdan û ne jî çî terefekî dine; wî got ku, rojava dibêje em dostên Kurdan in û wan

Wek nimûneka hevkarîya Kurdistanî bi hukumeta Herêma Kurdistanê ve qala PDK-Iranê û helwestê wan yê baş kir. Ka çawan çaxê li ser sînoran bûn ne wan û ne ji gundên ser tuxiba yê Kurdistanana Başûr çî rehetiyek nebû. Hukûmeta Herêmî ji wan xwest ku ji sinor dûr bikevin bo nav axa başûrê Kurdistanê û wan weha kir. Niha xebata xwe ya rêxistinî û ragehandinê û heta ya çekdarî jî didomînin.

bi tenê nahêlin, lê bi lênerîna wî Kurdan pêwîstiya bi gerantiyên navnetewî, gerantiyên civata Êmnahiyê û gerantiyên dewletên mezin heye. Wî tecrubeya salên bîstan û sihan û pîrsa Kurdan û Sewr û Lozan û perçekirina başûrê Kurdistanê bi Îraqê ve anî zimên û dakokî liser hindê kir ku, "divê em Kurd her tim di bizavê de bin û we bikin ku hemîşe kamîreyên televizyonan û ragehandina cihanî qala pîrsa Kurd bikin û raya giştî jê re teyar û saz bikin."

Ka digel çî alternativekê ye ji bo hukmê Îraqê got: "em digel alternatîva demokratîk in û jê re xebatê dikin, lê divê ev alternatîv mafên Kurdan bide û weku mînak Federaliyê bipejirîne."

Piştî Samî Abdurrahmanî axiftina xwe bi dawî anî, pirsiyar jê hatin kirin. Di bersiva xwe de li ser pirsiyareke girêdayî hêzên hevsozan û alîkariya wan ji Kurdistanê re got "Hevsoz ne ji ber xebata me ya çekdarî hatine û alîkariya me dikin, lê ji ber reva navdar û kartêkirina massmediyan li ser

raya giştî ve dikin."

Pirsiyarek derbarê helwestê wan li hember PKK'ê jê hate kirin û wî di bersiva xwe de weha got "em dixwazin PKK jî we ku hemû partiyên din reftar (teserufê) bike. Çawa em ji çî partiyêke din Kurdîr nînin her weha ew jî çî partiyêke din Kurdîr nînin." Ew jî xiste ber çawan ku çî dewletek qebûl nake leşkerê dewleteke din bê razîbûna wê bikeve hundirê axa wê û li ve derê Samî Abdurrahmanî pirsyar kir ka dê çawa Tirkiye û Îran qebûl bikin, êrîş ji başûrê Kurdistanê biçin nav axa wan û ser wan. Wî xwest Kurd li du çareserkerinên bi mantiq bigerin.

Babetê guftûgoyan bi Seddamî re di pirsiyarekê de hate pirsîn û got ku çî xeberê wî nîne ku guftûgo hene. Bi gotina wî; ew nikarin ji rejîma Seddamî re çî bikin û herweha Seddamî jî çî ji wan re nîne.

Di bersiva xwe de li ser ka çima giftûgo li Bexdayê û ne li cihêkî din tîn kirin, diyar kir ku ew beşdarî piraniya giftûgoyên bi Îraqê re hatine kirin, bûye. Ew bi we re ye eger giftûgo li derve bin, di bin garantî û çavdêriyê navnetewî de bin dê çêtir be. Dê ragehandin û her weha raya giştî ya cihanê pê agahdar be. Lê digel ve jî bi hezkirina wî "eger giftûgo li Bexdayê jî bin Kurd dev ji mafên xwe bernadin".


Di bersivê de li ser pirsiyarekê, helwestê xwe li hember INC xuya kir û diyar kir ku ew beşekî serekî ne ji INC û rolekî wan yê serekî tê de heye. Herweha anî bîrê ku ji ber ku INC demokrasî û pîrpartîbûn û federaliyê qebûl dike, loma ew jî pê re ne û eger ew di programa wan de neman êdî ew jî pê re nabin.

Helwestê xwe li hember dewletên Rojava û dewletên cîran di bersivdana xwe de li ser pirsiyarekê da nasîn. Dakokî li ser hindê kir ku pîrsa Kurd pîrseke dîrokî ye, pîrsa dabeşkirina Kurdistanê girêdayî dewletên cîran e. Bi lênerîna wî heke dewletên cîran nebin, Kurdistanê hemû bîgehên dewletbûnê hene. Û wî got ku, "ji bo çareserkirina pîrsa Kurd divê axaftin û danûstendin direkt bi Kurdan re bîn kirin". Gazin ji alîkariya Neteweyên Yekbûyî (NY) kir. Bi gotina wî jî ber ku peywendî û danûstendinên NY bi Kurdistanê re ne direkt in, lê di gelek riyên din de ne.

Pirsiyarek li ser Kerkukê û pêşeroja wê jê hate kirin û wî jî got; "em dê hezar salên din jî xebatê bikin û dev ji Kerkukê bernadin. Gelê me nuha agahdar e û baş dizane ku Kerkuk û Zîmzar û Xaneqîn û Şingar û Şexan her ji kevin de yê me ne". Qala yekê jî wan guftûgoyan ku ew bi xwe tê de bû, kir. Got di destpêka axaftinê de berpirsiyarekî Îraqê got:



S. Abdurrahman: "em dixwazin PKK jî we ku hemû partiyên din reftar (teserufê) bike. Çawa em ji çî partiyêke din Kurdîr nînin her weha ew jî çî partiyêke din Kurdîr nînin."



S. Abdurrahman: "Şikestina Dînar û giranbûna buhayê tiştan û nexasme yê serekî axift. Kurdistan yek ji dewlemendtirin deverên Rojhilata Navîn destnîşan kir. Lê, got ku, destê wan girtî ne û nikarin tişt û dezgeh û maşînen pêwîst bo çêtirîkirina rewşa aborî û damezrandina kargeh û fabrîqeyan bikirin û bibin Kurdistanana Başûr"

"Kerkuk Erebi ye" Barzanîyê nemir dest da ber devê wî û gotê "Ne xêr bibêje Kerkuk dagirkirî ye".

Li derveyî ve axaftina Samî Abdurrahman ku li Federasyonê bi berpirsiyarên Hêzên Kurdan re kir, min pirsiyarek li ser fiftû-fiftû û ramana wê weke xwe û bêzarbûna xelkê başûrê Kurdistanê û ka dê hilbijartin di demeke nêzik de bîne kirin, jê kir. Bersiv bi vî awayî bû: "Bi rastî pîrsa pêncî-pênciyê ku çêbû derbirin bû li ser rewş û awayê hilbijartinan û parlamentoya Kurdistanê hukûmet jî li ser wî esasî hat çêkirin.

Rengê çewtiya hatiye kirin ewê fiftû-fiftiyê xwe gihande cihên xwartir û wezîfeyên biçûk jî. Bi raya min ew rastiyek bû diviyabû li Kurdistanê û ji ber barê me yê hêsta giran û dijwar û problemên mişe û zor, hukumeteke îulafî bê te damezrandin.

Dibe nîv bi nîv carê weke me

gotî zêde bûye yan çûye xwarê û dibê li aliyekî din jî aliyên xwe yê pozîtîv ji dest xwe dabîn. Xwe ji yê ve parlamentoya li gor qanûna hejmar yek ya Kurdistanê sê sale ne li ve gulane li gulana piştî wê sê sal tamam dibin. Nezikî 13 mehan mane. Rayek hebû û ew ji raya partîya me bûye ku îsal hilbijartin bîne kirin. Lê eger ev hilbijartin bîn kirin divê berî her tiştî hejmartineke runîştvanan çêbibe.

Hewil jî bîn dan ku hilbijartin bi awayekî pak bîne kirin û tezwîr nebin. Divê bi encamên wan razî bibin.

Lê me bawerî heye ku dê em piraniya dengên bibin û dê em bikaribin bi rengekî çêtir îdareya Kurdistanê bikin.

Tekst û Foto:

Sidqî Hirorî

Reng e ev hevpeyvîna li gel Hendirên ji bo wan kesên ku hînî hevpeyvînên rojnamê û kovarên Kurdî bûne, piçekî aloz be!

Ji ber ku em hîn bûne ku helbestvan û romannivîs û çîrokvanên me di hevpeyvînên xwe de li ser her tiştî dipeyvîn -ji bilî- helbest û roman û çîrokê. Herwiha em hînbûne ku sêparên axaftinê li ser kurtejiyan û berhem û çalakîyan be.


Di sala 1963'an de li Hewlerê ji dayik bûye

* Li sibarê çîyan te wenda dikim li pêdeştê te dibînim (pirtûka yekemîn-1988)

* Nimêjên dawîn ên çîya û sefera Mehal (pirtûka duwemîn-1993)

Hevalê me Ehmed Huseynî ev hevpeyvîn li gel Hendirên amade kir.

Armanç



Hendirên: Gelek nivîskar hene ku zimanên wan welatên ku lê rûniştine ji xwe re hîlbijartine. Gelek ji hene ku bi wan zimanan dinivîsîmin ku li wan hatîye ferzkirin wek nivîskarê Kurd, lewra qise û lêkolîneke zor pêwîst e.

Hendirên:

“Mîna ku ji rondikên te ji dayik bûme neku ji te dayê!”

Armanç: Zarokti mîna istgehê seretayî bo damezrandina giyanê helbestvan, wek çîhaneke nediyar û sext, ma gelo ji wê istgehê û ji wê çîhanê çi li ba te maye?

Hendirên: Pirsên hebûna mirov ji bûna zaroktiyê reha-jo ne. Dema ku zarok- wek çîhaneke- ji wê istgehê xatir xwest, îca meznahî pêşwaziyê dike, lewra jiyan dibe xewneke bêzar, çîhan jî bi hemî kûrahiyê dibe istgeha çavliwêzê birêveçûnê û ew istgeh bixwe jî dibe gera di rojeva pirsên nediyar de û di nehogiriya wê zaroktiyê de. Ez jî anuha, anuhayike kavirîni me. Anuha ez di hişyariyê xewnewî de hest dikim ku ew xaniyên zaroktiyê ku do êvarê min bi tenha xwe xweliya rêça gundê me bi mîzê kiribû herî, bi nîvçeyî min bi cî hişt. Anuha jî ez nikarim bizîvirim wî xaniyê daku tewaw bikim.

Wê wextê, havînan, ewqasî zevî hişk dibûn, min hest bi tînahiya zevî dikir, lewra min dixwest di şûna ku li destmêjxanê mîz bikim, ez diçûm min li ser wê erdê mîz dikir. Wa min hest dikir ku bi wê mîzê ez dikarim tînna zemîne bişkinim, lewra dengê ku ji zemîne derdiçû bo min çêjê taybet durust dikir. Zarokti ew babelîska bejin zirav î dijêje, ku bi pêşbirkî hetanî qonaxek dût li pey direviyam, min dixwest bigingivemê, lê zora min dibir.

Mirov bixwe her ji zaroktiyê ve, azadiyê tam dike. An jî azadiya a nuha bi paşeroja azadiya wê mindatiyê tete pêkanîn. Ez bi xwe çawsawetirîn zarokên nivîsê xwe an jî hemzayên xwe bûm. Wate bê azadîrîn mindal bûm. Herdem bi-

karanîna zaroktiyê li min qedexê dikirin, wê qedexekirinê ez çêkirime, hebûna zaroktiya min çêkirî ye wek zarokê berhelîstkar (mumariz) ku bi tu tiştî razî nedibû, biyanî û tenha û bê par. Lewra her ji wê demê veye ku ez bi çîhan û jiyanê ku nayên girtin girêdayîme, herweha bidestxistina wan jî mehale. Lîsk û henek û qerfên zaroktiyê bi sedemên çavtirsandin û qedexekirina malbatê giyanê zaroktiya min ji wan tore bû. Taku wa li min hat ku ligel zarokan neguncim. Di bareya (haleta) ne xurîstî de ne dikarim biçim nav mindalan û ne jî nav mezinan. Bê ku bivêm, bê ku bizanibim, bê ku xwestina min be, tenhatiyê û awêzeyê (şaz), ez ji xwe re hîlbijartim.

Di tenhatiyê req û çol de endamên laşê min mezin bûn û Firajan bûn (pêgihîştin). Wê demê serêşekê dijwar, ji nişkê ve, ez girtim, ta ku wa li min hat ku mehekê li nexweşxanê mam bêyî ku bizanibim li nexweşxanê me. Beherhal, pîrsa li ser zaroktiyê wa dike ku bersiv jî pîrseke seyr û mat be, wek bêhûdeyîya zaroktiyê li beramberî vî gerdûnê tevlihev. Ji dayikbûna min rêkewtekî (sudfe) ji bîrkirî bû, ez bêyî tîgihîştin tîgihîştim...

Di bîra min de ye, hê biçûk bûm, diya min hergav digot "tu bi bextreşî çê bûyî, tu kesî bawer nedikir ku tû bijî", hetanî ciwanîyê jî laşê min ligel xurîstê nedigunciya. Bi awakî zikmakî min ji tiştên wêze (ne asayî) û biyan û ne xurîstî hez dikir.

Diyarde û bizavên xurîstî û gerdûn ji bo min tiştine afsanewî û balkêş û seyr pêşkêş dikirin, şevên havîne dema ku li ser ban

radizam, çuriskandina stêrkan ez bêgav û sûrdar dihiştim. Ku stêrkek dirijîya, min çavên xwe bi xurtî dikutkutandin, ji min weye ku ew stêrana ji ber pevçûnê ji ser rûyê esman dişemitin û bi ser min de dikevin, min dişewitînin. Ji min weye ku ezman jî wek gundê me bi xelk û mirov e; û bi piyan li ser rêça kakêşê sefer dikin, lê belê min nizanibû diçin kuderê?

Ew hemî helbest bûn Ehmed! A nuha ez wa dizanim ku helbest zimanê wê zaroktiyê ye. Dema ku mirov hewldide, di nav wê çîhana nediyar de, ku wê çîhana zaroktiyê dirust bike, nayête dirustkirin û ne jî damezirandin.

Ew şevên ku derwêşên gundê me bi cizmê diketin, em bi dizî diçûn cem wan, û wekî wan min jî serê xwe badida. Li wê "Çîhana Derwêşan" min hest bi tiştêkî ne asayî dikir ku pîr nêzîkî hestê min bû lê min nedizanî çîye...

Jiyanê wa li dayika min kiribû ku bibe jineke xemgîn û rencdar, dema ku mala me vala dibû dest bi dîlokên dikir. Dilop dilop rondik bi ser hinarkên de diherikîn. Ez biçûktirîn zarokên dayika xwe bûm.

Diya min bi wan dîlokên, bi wê xemgîniya qalind, bi wan rondikan ez şîrdidam. Hemî reşbextî biwan dîlokên destanemêz di giyanê min de çand. Dema ku dayika min ew dîlok digotin ji min wê karîsatê bêje: Rondikê diya min ez tûşî helbestê kirime" Mîna ku ji rondikên te ji dayik bûme, ne ji te dayê !!!

A nuha ku tu min vedigerîni zaroktiyê ev perçe helbest hat bîra min, ku bi bê agahî di sala 1984'an de min nivîsandiye û rengdana salan bû.

Bi herhal Ehmed! Tu dizanî ku

vegera li serpêhatiya wê istgehê tiştêkî sext û aloz e, çûnkî pîrê, pîra demê çîhanek û gerdûnekî bê ser û ber ristîye, îca serê ta dê li kuderê bê girtin?

Ku ji laşê xwe derdiçim, diçim û vedigerim termê wê zaroktiyê. Giyan di navbera van herdu istgahan de bi rê di keve, istgeha a nuha û ya zaroktiyê û her û her giyan nikare dev ji wê qunaxa di navbera herdu istgahan de berde. Û çîhana piştî a nuha jî rêçên seferê tere naçin. Mirovati li her astê deyndarê wê zaroktiyê ye.

Armanç: Di diwana xwe de te dixwest tu çi bibêji, ma gelo tiştêk heye ku te xwestibû lê te nenivîsandiye?

Hendirên: Ev pîrs stûna pîrsan e. Di vî pîrsê de destpêka rêçên ku ji bo bersivên bê kutayî diçin, dest pê dike. Eger pêwîstiya arezûyan li cem helbestvanan bi wan karên ku nivîsîne an ku dinivîsînin, bi dawî hatibûya, gerek ji mêj ve bêdengî bibûya siruşt mirov û helbest jî ji sihra xwe vala bibûya.

Na...Gerek te bipîrsiya, di vî çendayetiya rehayî (mutleq) de, cûreya "Diwa niwêjekan" gîhiştîye kuderê; bi nisbetî kûrahi û panava rehayiyê?

Li wir bi bê erkên wextên sînokirî ên nimêjê, bi hawara dijwar, bi rapêçana qonaxan, li ser sicadeya zeviyekî bê destnimêj û esmanekî dükeldarî hevdû himbêz- kirî û qubleyek şewitî, nimêj dest pê dike.

Li vir, reşê çîya bo sefera dinyayî wê qubleya mehal careke di dizîvirîne. "Diwa niwêjekan" nimêjên dawîn in. Ne ku sereta û navend û kutayî ne. Helbestên diwanê bend û ayetên dawîn in, ne ku

sereta ne. Îca eger sereta nebe kutayî li kuderê dest pê dike.!!

Eger wisa be û "Diwa niwêjekan" kutayîya wan destpêkan bidda, bê guman dê bikarîbûya kura- hiya pîrsan jî bike.

Giriftarî û dudilî û nerazîbûna min hemîş e ewe ye: Ewên ku min dixwest bêjim min negotiye û min nenivîsandiye. Sihra helbestê û dinya mirov di wê de ye ku tu carî bi arezûyan, bi daxwazan û bi nerazîbûnê bi dawî nabe.

"Diwa niwêjekan" sêbera reva binarên wan çiyayan in, ku kevokên bejî xewnan di nav de wekî hêkan dinukulînin, sermestî û gêjbûna rêçekê ye ku nagihêje cî; ku bo wargehekê diçe lê dighêje warekî dîtir ku nenas e. KAFKA ji mêj ve li ser vî nakokiyê gotibû "Ez diramim ne wek ku ez dixwazim biramim. Ez dipeyvim ne wek ku ez dixwazim bipeyvim. Ez dinivîsim ne wek ku ez dixwazim binivîsim".

Na...Ev nivîsandin gerek bû wek "Xweya" rehayî ya nimêjan reha bûya, lê divê em wek Dostayevskî bêjin "Axaftin pêwîstî ye lê bê dengî huner e" herwiha "ê bêdeng her û her ciwantir e jî ê axaftinkar".

Îca "Diwa niwêjekan" tevna bêdengiyekê ye, bo dahatû ew sefer e, eger bikaribim, dibite ezmûneya dahatû ya wê seferê.

Na...!! nimêja çiyayan ji nimêja helbestan firehtir û bi xirecirtir e.

Li wê derê dengê nimêjan nayên girtin, li vir bo girtinê hêsan diyar dibin.

Gerek biçme wî banê li ser gerdûnekî tevlihev û temaşe bikim û balefirên kaxezî yên hişk xwe bifirînim û bîranînan li gel wan bi rê ve bişînim. Li wir dahatû bîn in, wate seferî mehal destpêka nimê-

hevpeyvîn

jên bê kutayî ye.

Îca gerek em bi şeweyekî sefer bikin ku di nav wê seferê de nimêj ne wekî xwe bêtin kirin. Li ser piştê sicadeya peyvan em bi awakî dîtir nimêj bikin. Û tabloya hemî rabirdû bikşînin. Nêçîrvaniya li çîyan dixwaze ku me na xurista çîyan bi awakî dîtir bi me ne bibe. Çûnkî ji derve peyvîn li ser çîyan tu tiştî di helbestê de naguherîne û ne ji digihîne.

Lewra gereke em bêjin ku ne-nivîsandina helbesta li ser sîmayên derve ên çîya baştir e ji nivîsandinê, wate, divê guhê me li naxî (hundir) çîya be ne ku li dervî çîya be.

Bo masîgirtinê di derya nax de pêwîst e em naxê masiya helbestê lêbigihên, ku li dirêjahiya heyîna bûneweriya masiyan pevcûna ji bo masîgirtinê merqûrtir dibe.

Wate derûn (kurahî) rastiya "xweya" mirov e. "xwe" ji hemî tiştan diyar dibe û-razî ji nabe!!

Dema ku ez li ser kûrahiya "diwe niwêjkan" diramim, hemû tişt çirayî ne, me ne ji "xwe ya xwe" direvin û wateyê dîtir didin. Zorcaran, dewrûbera mirov zimanê derbirinê ferz dibe, lewra asoya firînê teng dibe. Herwiha, deryaçeya kûrahiyê şêlû dibe. Mirov dixwaze birije, lê tu nizanî ka ew lehî diçe kuderê? Hest xwe daweje bextê laşê peyvê. Paşê ku li wî laşê temaşê dibe ku di binî wî ew laş qermiçiye, laşekî çelmisî, mirov bi xwe ji nizane ka ew hest ji kuderê têt. Hest zixta wehmî ya tiştên bejî ên wê bûnê ye, ku di nav bûneweriya me de rijyaye, "xwe" ji têkel bûye. Mirov sergerdanê mirovatiya xwe ye, "xwe" ji merqûrê ve sergerdaniyê ye.

"Diwe niwêjkan" destê li cîmayî ye wê dergûşê ye ku doza hejandina destê dîlokek dîtir dibe. Sîbera wê şûnşopa hişkbûyî ye ku ligel sefera rokê diçe. Sefer ji îstgehên van nimêjan diyar dikin, rêçên di nav wan îstgehên de tarî û çol û bêzar in, ji bilî min tu kes li wir nîne; amadekirina kesên û tiştan bo hewldanê hergîz, ji bo pêkanîna wê cîhana ku di xewna min de ye û tu carî pêk nayê.

Dema ku helbestvan kes û tiştan bikartînin, çi taze bin û çi ji dîrokî bin, ji bo wê ye ku xewna xwe fireh bike û wateya rengê cîhana xwe li hemî tiştan bipêçe.

Armanç: Di dema pêşmergeyatiyê de, çawa helbest dihat parastin, ango bi çi awayî giyanê HENDIRÊN ê şairiyane li gel jiyana rojane ya çek û çîyan û pêşmergan, çawan digunciya?

Hendirên: Pêşmergeyatiyê bo min dibistanêke brefireh bû. Li wir ez fêrî zorbey pirsên jiyane bûm; bêyî ku daxwaza min be bêyî ku peyrawa (praktîk) wê dibistanê daxwaza min be. Pêşmergeyatiyê ew şûn e ku rê dide mirov ta ku xerîzeyê xwe ya dirindane yî ne diyar bikarbîne. Serbazgeyêk bû bo hêz û bazû, kuştargêha nazikîrîn hestên mirov bû. Doravêk bû bo çek û mirin û raperînê û xerîzeyên mirov ên dirindane tê de rewan dibûn. Li wê jiyane, pevcûna mirov li gel mirinê bû. Mirin û jiyana du laş in di wê doravê de bi pev diçin. Bi demê re hebûn dibe mirin, mirin dibe hêzek mezin û ji paşê te venagere.

Di xerîçira bê wextiyê de, bê agahdarî, hevaltîyek dilovan û dil-

sojane di navbera te û mirinê de têt damezirandin. Mirin her tiştî ji te re dike kurtepişt. Wek serencam, di wê serdemê de, ez xwe bawer nakim ku ez dikarim di yek dibistanê de ji dibistanên wê jiyane fêrî tiştêkî bibim, herweha ez bawer nakim ku dikarim li gel rêbaziyekê, ramanekê an ji rewîstekê biguncim. Lê ez pir kêfxweş im ku ez ji dibistana wê dorava ku mirovan hînî mirinê dike, derçûme.

Eger li wir nebûma min dê naveroka mirov nenasibûye, an min dê bi şaşî ramanên wê cîhanê wergerîbûya. Pêşmergeyatiyê imtîhana hemî xerîzeyên mirov e. Li wir, helbest niçira tiving û gullan bû. Li wir, helbest dilekî azad î ebediyane bû. Parastina şîr wek parastina laş ji destê mirinê bû. Çawa man qeder bû, helbest ji bi wî awayî dilê destê qederê bû. Lewra xurista wê jiyana qederiyanê zor helbestên behremend kuşt. Zor ji durst kir. Di wê dorava gerdûnî de, naverokêk jiyane hebû, mebesta min di "xwe" ya wê jiyane de peywendiyêke rast û xuristî li gel xurista tiştên nehênî hebû.

Carcaran helbestê û navika veşargêhê di hinav de wek du evîndaran hevdu himbêz dikirin. Îca hest û sîmayên rimakî (Fitri) ên dirindane yên xuristê diketin vehesînekê, lewra hest li gel wan sîmayên dirindane yên xuristê digunciya. Wê wextê, dema ku em di Tengerêyên tirsê de yên şeva tarî dibuhirîn, kontarên bêdeng û rewan û bêkes dibûn wargêhên vehesîna me.

Sernivîs, wêneyên şikeftan, xurista çîyayên berz ên mişt nehênî wek sînga mirovan, hemî bi hev re hestên lê ewlebûnê ji dayîk dikin. Ew wêneyên, xeyalan diafirînin û xewnên wek destanan çê dikin. Îca şîr wek masiyekî tevîzî, di wê demê de, dest bi jenê dikir.

Di wan 8-9 salan de peywendîya min û şîr wek peywendîya du evîndarên gundî bû. Bi şev, di himbêza raz û nehênîyan de civana min li gel helbestê dest pê dikir. Civanek pir bi dudilî û bi çêj û bi nehênîamêz, di destpêkê de bi awakî sade û tîrwanîne û romantîkî li beramberî pêşmergeyatiyê û jiyane dest pê kir. Helbest ji ket tora sadeyî û sloganê de, lê paş demekê zor kurt, min ew babet şîr berdan. Bê agahîya min; bi xirecir û qîjeqîjî û bi rûdawên ber bi çav û bi bandûra dewr û ber hatîbûn nivîsandin. Helbest li wir, dawekarî bû, wek ku çawan hin asteng û rewşên sexte hin ji xelkê dikirin pêşmerge û piştî demekê an diketin an ji wenda dibûn. Li wir helbest ji bi dû programa partîyan de diçû. Li seranserî wê demê hemî diwanên ku li "dezgehên ragîhandinê" ên partîyan hatin çapkirin, buhayê gulleyekê nedikirin.

Daxwazkarên helbestê ew bi xwe nemana helbestê bûn. Min bi xwe wek xurist û mirov hiç ji wan berhemana hez nekirîye ên ku xelk bi asanî tê bigihêjîn. Çûnkî ew berhemên hunerî yên ku li dora me kom bûn, tiştine pir lawaz û pîs bûn û aliyên xwe yên sihîrî wenda kiribûn. Wê xuristê şîr li ba min kir laşekî pakzad (qîz) û ji hemî girîngiyên girîngtir. Li wir, helbest tenê bi rîya aheng û mûnasebetan dîyar dibû û daxwaza şîr çêdibû, îca zor helbestvan ku ne helbestvan bûn bi navê şîr navdar bûn.

Wek çawan pêşmergeyek bo çend çalakîyan navdar dibû û bi wê navdariyê derece werdigirt. Helbestvan ji bi wê pîvanê.

Bi kurtî, ew tiştê ku navê helbesta Kurdî a pêdariyê li serferz bû, ta nuha helbesta Kurdî kuştîye. Li ba min, bê şîrtirîn şîr şîra pêdariyê ye, bi taybetî ji di şîra Kurdî de. Çûnkî ew bûyerên ku helbesta Kurdî hewl da ku wan berceste bike ji wan bûyeran qelstir bû. Tu bertekê baş pêk nanî. Bi nisbetî min, min laşê giyanê xwe bo wan bûyeran kir bi qurban da ku ez jiyana helbestê nekim bi qurban û ji dest xwe wenda nekim. Dema ku min pirtûka xwe ya helbestan ji bo yî çapê amade kir, berya ku belav bibe -bi mebest ji alî berpirsaran hat çirandin û wendakirin- min ew helbestana tev avêtin çûnkî daxwaz

Bi a min ew romana ku bi navê Roman hatiye nivîsandin, û min xwendîye, li bakur û başûr û li rojhilat û rojava, hêjî, asta hikayeta lîvîkî a folklorî derbas nekiriye. Beşek hin ji wan hikayetan di bin bandûra klasîkên Ewropayê de hatine nivîsandin (ku anuha em di sedsala 20 û nîvan de ne) wê bandûrê ji hiştiye ku çêja ciwannasiya xuristî ya Kurdî wenda bibe. Herwa, beşek ji wan romanên bi dunya qalibê realizma sosyalist bi gewde bûne, ji xwe ew şewe xwe bi xwe kuştina hunerkarî û giyanê romanê ye.

û arezûya wê rewşa ne helbestî bûn. Li wir, helbest hevlekî dilsojê giyan bû, giyanê ku di dorhêla xwe de mişext û biyanî bû. Helbest di şikefta giyanê de, wek sofîkî xelwetgir gêwîlên xwe bikartanin.

Jiyana ku xwe berdaye kûrahiya kûrahiyê de çawan ji bir bibe? Qurban, bûyerên dijwar, xemên sade yên pêşmergan, tiştên seyr û surdar di xurista jiyaneke qereçiyane de, evîndariya efsanewî ya li ser piyan, keçe gundînişnekên, canfidayî û şehîdbûna biraderên dilpak, sotan, koç, tirs, pêkenîn, girî, girî li berzîrîn rada mîrxasiya mirovî de. A nuha ku awir didim pêşmergeyatiyê surîştê wê jiyane bi hemî reqî û dirindaneyiya xwe çameyêke diramatîkî ye.

Armanç: Tu dikarî bi kurtî wateya van wişeyan ya helbestiyane derbibire bidî: evîn çîya, kevok, Kurdistan û Lissa?

Hendirên: Evin:-Piyaseya di daristana tenhatî û sûrgunê de, di welatê sermestî û gêjahiyê de, geryana bêhude ya bi dû çêja xweliya efsanan de. Xapandina bi bawerkirina xwedakî mehal, tîqetîqa di xewneke zarokî de. Raperîna li hember demê, bişaftina di nav rewreka li ser kûr-xeyalan. Têgihîştina şehweta ba. Axaftin bi zimanê bêdengiyê, qulûzbûna bi lîrê ya li hember sîbera pêkenînê şermîn ên sîmayên şaytok ên avê, xwe binavkirina di nav pêlên şêr ên giyanê de. Şoreş li hemberî qeşagirtina aqil. Hilgirtina gopalê "weli Dîwane" ye. Çûna di nav çîyayên hovane de. Evîn, yan perîşaniyên pîrozî ên xwedanên dayikbûnê.

Çîya: Bixçika bîranînê sermedî, serûkaşbûna bi ser lûtkeya mirinê de û xwendina berî dîrokê, stranên xewnan. Deftera destnîvîsa dîrokekê ku serî li ber dîrokeke dîtir hildaye. Bîna ku li şûna civana bin heyvê, maye. Derçûna ji teweran (çerxan). Negudina mirinê. Qurana şerê serdeman. Mûzexaneyê kevirên nivîsên destan û karîsatan. Li hem-

ber xêzên jeografîyê rawestan û li dimenan temaşekirin ji berzûneke reha. Dergûşa bîrgirtina brîndarê nalenalkar, nîşana hebû-neke jîbîrbûyî. Xwarina birêketina ber bi tîrêjên sor ên welatê roavahiyê.

Kevok: Xwendina li ser kêla gora aşîtiya ciwan. Mirî û evîndarekî bê mirad. Aramdan û gumeguma bêzariyek kedî di gorepanên paytextan de. Dayîka xewna li cîmayî a çîyan û sîmayê zarokêkî hovane. Nîşana evîndarekî sofî û halgirtina teqleyên xelwetan, pakqîztirîn keça teyran. Bîna wê maçê a ku di dîdarekê de bi gêjî têt maçkirin.

Kurdistan: Rehên hebûnê, wek rûyê dayîka min ê mişt firton e. Oqyanosek bêjîbûyî, pirtûkek pêkenînan, nexşeyek endam belavbûyî, li beramber govenda li ser

niya azaran serzar bike de çawan bikaribe melevaniya giyan bike? Pirs din ji ev e: Ev zimanê dagîrkere ku hiş û yadgirî û giyanê pê hatine damezrandin, ma gelo dikare wî zimanî (mebesta min Erebbî ye) bi wê cureya ku mebeste, dikare bike berteka şerê ferzbûyî?

Pirsa li ser wan Kurdên ku bi zimanên dîtir dinivîsin, girîdarî ye û diyardeyek fireh e. Reng e ne tenê tevlihevîya nivîskarên Kurd be. Gelek nivîskar hene ku zimanên wan welatên ku lê rûniştine ji xwe re hilbijartine. Gelek ji hene ku bi wan zimanan dinivîsin ku li wan hatiye ferzkirin wek nivîskarê Kurd, lewra qise û lîkolîneke zor pêwîst e. Bareya (haleta) Kurdên Erebnivîs û ên zimanên dîtir, bi şeweyekî taybet û lîkolîneke qol dixwaze, ne wek ewên ku îro li ber dest in. Bi a min... peyvên ku li ser wê diyardeyê hatine nivîsandin, helçûn in û berçavten-giyên Kurdan in, bê ser û ber û bê naverok in. Ev ji kuderê têt? Bêguman ji wî şerê regezperest têt, ev şerê ku ferz bûye.

Ji alîkî din ve, ji ber tunebûna hesta zanîna nimûnedar a ne xwe bi xwe, têt. Ku di edebiyata me de nimûneyên wek SELÎM BEREKAT, YAŞAR KEMAL, MIHYEDÎN ZENGENE û çendên dîtir ji wê babetê li cem me nînin û kes jî vîya nabêje. Çûnkî afirandinên ku Kurdan bi zimanên dîtir nivîsandine, tu kesî, bi realîstî û bi şeweyekî dîrbînanew ew (mebest afirandin û berhem in) li gel berhemên Kurdên ku bi Kurdî nivîsandine, mûqarene nekirine. Eger bînan mûqarenekirin û bînan tîgihîştin, wê gavê emê bikaribin bighêjin rastîya nimûnedar.

Peyivîna li ser wê mijarê wextekî dirêj gerek e mixabin ku li vir ew wext nîne.

Armanç: Li cem we romana Kurdî gihîştîye kîjan astê?

Hendirên: Gûftûgoya li ser derketina romana Kurdî ji demekê û virde bûye mijara danûstendinê. Zorbeya lîkolîn û rexne û nixandînan (ger em wisa wan bi nav bikin) ku li ser roman û romannivîsandina Kurdî û bi hemî zaravayan hatine nivîsandin -tiştê ku min xwendîye yan ji a ku min ha jê heye- zorbeya wan zimanê hesta xweşbenî û pesindanê ne.

Her wek asta giştî ya rexnegirîya me, rexne û lîkolîn ne xwendina bîngêhîna romanê ne. Di salên 80'î de, romannivîsîn bû daxwaz û arezûyêke hêrsamêz û komek ji pirtûkên stûr, valahîya refîkên pirtûkxaneyê Kurdî dagirtin. Vêca ku waye, romana Kurdî ji kete ser rêça çûnê û bi hebûna wan romanên em dikarin li ser romana Kurdî bipeyivin, li ser wê bîngêha hejar û lawaz biaxivin; Li gel hemî hokar û asteng û alozîyên ku eşkere ne û gerek em wan ber bi çav bigirin.

Bi a min ew romana ku bi navê Roman hatiye nivîsandin, û min xwendîye, li bakur û başûr û li rojhilat û rojava, hêjî, asta hikayeta lîvîkî a folklorî derbas nekiriye. Beşek hin ji wan hikayetan di bin bandûra klasîkên Ewropayê de hatine nivîsandin (ku anuha em di sedsala 20 û nîvan de ne) wê bandûrê ji hiştiye ku çêja ciwannasiya xuristî ya Kurdî wenda bibe. Herwa, beşek ji wan romanên bi dunya qalibê realizma sosyalist bi

Ew zimanê ku nikare meleva-

Çand û wêje

Ziman û afirandin

2

Pirtûk, gotar, lêkolîn û çend cûre nivîsên rexnekariyane yên ku di vê pêla dawîn de li ser û ji bo rewşa zaravayê kurmançî hatine nivîsandin, herweha çend civîn û konferansên hejar ên ku li ser çawahiya pêşvebirina kurmançî û bi çî awayî guharandina çend tîpên Elfabayê û hewlîdana peydekirin û berhevkirina peyv û wişeyên nuh û yên windayî, li gel çendîn çalakiyên ku hetanî vê rojê hatine kirin, ji çarçewa rêziman û rastnivîs û ji sînoren Elfabayê der neçûne, di encamên xwe yên dawî de tu tiştekî berbiçav ji bilî xwe dîbarekirin û wendakirina serê ta, bigewde nekirine.

Di aynî xwetê de, nivîsên ku biyanîyan li ser rewşa zimanê kurdî nivîsandine, û Kurdan bi zimanên biyanî, di naverok û sewyeta lêkolînê de û di hilbijartina mijaran de balkêştiyên û dolmentîrîn berhem tîn xuyankirin.

Îca, û bi xwe spartina li ser vê bîr û baweriyê, mirov dikare bêje, zimanzanî- Bi wateya xwe ya giştî û berfireh- di cihana çend û wêjeya Kurdî de wek zaristiyêke civakî, di rojêwa hişyariya netewîde, nehatiye damezrandin. û ne ji li ser nexşeya guftûgoya girêdayî bi çarenûs û pêşeroja çanda gelê Kurd, xwe daye destnîşankirin... Di gel ku her kes di vê qonaxa bê pîvan de dikare bibe nivîskarê Kurmançî û hemî babetên edebiyata Kurmançî û bi ser de ji dikare- li gor rewşa îro- bibe zimanzan û lêkolîgerekî bêhempa.

Îro em di diyardeya rêziman- zanan de dijîn, ne di diyar de ronîkirin û revakirin û çareserkerina pirsgrêkên zimanê xwe de. Çinkî hetanî anuha rêzimanzanên me (!) nizanin ku bêtî peyivîn û lêkolîn û eşkerakirina pirsgrêkên bingehîn ên zimên û bêtî bi destxistina datayên nuh û hev- kêşên nimûnedar, ne rêziman û ne ji Elfabê dikarin ji cihê xwe bi pêş de bilivin.

Pirsgrêk û aloziyên ku îro li beremberî zaravayê Kurmançî serî radikin û di navbera hewlîdanên birêvebirina zimên û tîgîhiştina rastîn ya paşeroja Kurmançî de, çeperên tund çêdikin, gerek, bi taybetmendîya rewşa Kurmançî û bi wan pîrên ku di nav Kurmançî û Kurmançî axêvan de- pîrên ku hatine birrîn, û yên ku hêji li darî bînan û berbi çavkirin. Wate, wek ezmûneyek dîrokî em dê neşên rewşa zimanê xwe ligel rewşa zimanê dîrî di cihana de bipîvin. Lê em dikarin ji norm û metodan û ji felsefeya ziman û ji ezmûneya dîrokî ya çend zimanên ku di rewşa Kurmançî de derbas bûne " eger hebîn " sudekê, hem ji zimanên dorhêla xwe û hem ji ji awayên pêşveçûna zimanên navnetewî, wergirin.

Çinkî Kurmançî- wek zar- bi tena serê xwe dikare, li ser rewşa xwe, bîrînen xwe, mirina xwe, li kûderê ji me wenda bûye, di çend serdemên de hatiye gemkirin, û anîha çî di çawan rengekêşanê dibîne, bipeyive, ronî bike, lawazî û aloziyên xwe li ser sîfra balkêşanê raxîne.

Îca ji boyî ku ev peyvîcî û rewş- naxistin bibin bareyêke (haletek) berdest û berhest, pêwîste, hemî alav û şeweyên lêkolîna li ser rewşa Kurmançî bêtin guherandin, angû, pêwîst e Kurmançî- xwe bi xwe - bighêje qonaxekê ku êdî zimanzan xwe ji maka xwe bîafîne.

Nivîskarên ku bikaribin wê hêz û şiyana veşartî ya ku di hinavê Kurmançî de hatiye gemkirin, rizgar bikin û xwe mîna berpirsiyarên rizgarkirin û azadîkirina wê hêz û şiyane bibînin. Ne ku çend peyv û wişeyên- Erebi, Tirkî- ji nav ziman bavêjin. Ne ku peyvên Kurdî ji diwanên Xanî û Cezîrî û Cegerxwîn ji me re bi serê mûçingî bidin hev (digel ku gelek caran ew peyvana ne bi Tirkî ne lê bi Erebi ne yan bi Farsi ne!).

Zimanzanên ku bişên can û cesedê Kurmançî û Kurmançî (!) ji toza dîrokê û ji Erebi- Tirk- Fariskirîne dawêşînin, ziman bi hêzîrî bikin, şêrîrîrî bikin, angû, ziman bikin naveroka jiyanê, bikin bendên spehîbûnê, bikin avjîna pejn û hestan, bikin bîr û bawerî û nêrî û raman bo mirovan.

Di aynî wextê de.. ji bo ku em bikaribin şewê û alav û kategorîyên xwe di warê hunerên der- bîrîne de biguherînin û ligel vê guherîna siyasî û dîrokî û çandeyî ya ku li welatê me çê dibe, biguncînin; gerek em bi realistiyêke rehayî (mutleq) li gel rewşa zimanê xwe rawestînin, çinkî bi alîkariya wê rawestana realistane em dê pêşî xwe û rastiya rola xwe di cihana zimanê xwe de binasin; û paşê em dê Cihana li dorhêla xwe binasin.

Îca em bi xwe ji nakevin şaşîyan û em nabin barekî giran li ser milên zimanê xwe, û reng e ziman ji bikanibe rêça xwe bi tendîrîstî berdewam bike...

Di bawerîya min de, ji bo avakirina çend pîrên durust daku em bikaribin li ser wan ber bi kûrahiya alozî û pirsgrêkên Kurmançî de herin û vê qonaxa tevlihev û bêpirsiyarî li paş xwe bi- hêlin, giştîng e ev xalên jêrîn, bi hûngilî, di navbera xemxur û rewşên bîr û kesên ku xwe berpirsîyên çanda Kurdî dibînin, bibin stûnên guftûgoyên zaristiyane; reng e di pêşerojê de çend serencamên balkêş bi xwe re rakîşîne qada hişyariya mirovê Kurd a li ser ziman û afirandinê:

- 1- Bandûra zimanên biyanî (zimanên dagirkeran) li ser Kurmançî û Kurmançî axêvan çî ye û bi çî awayî rê li ber vê bandûrê têt birîn?
- 2- Bi çî awayî em dikarin peyvendiyan xurt di navbera hişyariya netewî û hişyariya zimanî- çandeyî de peyda bikin?
- 3- Hetanî kîjan qonaxê mirovê Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî hest dîke?
- 4- Mirovê Kurd bi çî awayî fêrî zimanê xwe bûye?
- 5- Peywendiyên ziman û ramanê, ziman û civatê, ziman û şaristaniyê çîne?
- 6- Kurmançiya ku îro li ber destê dikare biteqê û bi pêşve biçê an na?
- 7- Rol û erkên kurmançî di dîrokêde çî bûn û di pêşerojê de dê çî bin, angû kurmançî bi rola xwe ya dîrokî rabûye an ranabûye?
- 8- Kurmançî çîye, ji kûderê hatiye, kengî, çawa, ji bo çî?
- 9- Çawa mirov dikare aliyên şaristaniyê di zimanê xwe de wergire, ma gelo mirovê Kurd bi wan aliyên perwerde bûye an na?
- 10- Kurmançî şaristaniya gelê Kurd di xwe de parastîye an na?
- 11- Ma gelo hetanî kîjan radê zimanê dagirker mirovati, kesayetî û cihana me ya psîkolojî perwerde kirîye?

Ji bo ku em bikaribin bi zimanekî Kurdî- zikmakî li gel hevdu bipeyivîn û bi alîkariya vê peyivîne sînoren dagirkeran, bişkinîn, pêwîste rewşên bîrê Kurd xwe ji perwerdekirina kulturî ya dagirkeran rizgar bike û li zimanê xwe wek kesayetiyeke giştî temaşê bike. Reng e xwe ji wergerandina çanda dagirkeran azad bike û hestdaniya zimanê xwe yê zikmakî di xwe de durust bike.

Ehmed Huseynî

Serê xwe bi ser min de ditewand û ez dicivandim sînga xwe. Şerpa wê dişemîtî û ji ser eniya wê diket ser çavên wê û dihat ku bîkeve ser rûyê min, lê wê zû destê xwe diavêtê û li ser serê xwe diediland.

Bayê fikandina xwe berde- wam dikir û derî bi terqînî vedibû û dihat girtin wek ku dixwaze derbasî hundir bibe û min ji sînga wê birevîne. Ji lewra min xwe xurttir pê ve dişidand û rûyê xwe di nav paxila wê de vedîşart. Biskê porê wê yê dirêj bi ser rûyê min de diket. Min çavên xwe digirt û ez di nav tarîtiyê de dihelîyam. Dengê wê bi nermî derdiket û li dor min zîz dibû û wek avek germ di ser laşê min re derbas dibû. Min dixwest ez bigrîm lê ez ditirsîyam ku ne di cihê xwe de bim. Min çavê xwe diguvaşt û ez kurtir diketim bîra tarîtiyê. Bêhna wê diya min anî bîra min. Çaxê ez biçûkanî humbêz dikirim.

Ez vî alî û wî alî xanî dibî- rim, awazek ji stranên lorîkî digot. Şunde sitranên ser şer û ceng û tîrsê digot û her serê xwe dihejand. Axînek bêdeng berdida û qala Twaiz û Şêxobekir û Şêxadî dikir. Ez ji sînga diya xwe difiriyam, bi asmanan diketim diçûm nav stêrkan min ew yek bi yek jêdikirim, ez tenê çavgirtî di nav mîrgên kesk û şîn de digeriyam. Ez tazî bûm. Sivik wek perek li ser baskên bayê biharê ez di nav gulên renga reng re diçûm û dihatim. Teyr û beytik li

hawirê min difiriyam, pîrîrkên qeşeng bi refan didane kêleka min. Min bi kêf bera pey pîr- pîrîkekê da. Çaxa ez hatim wê bigrim ez ketim û çoka min xûn bû. Min hewl da ku ez rabim lê



min nekarî. Ji nîşkave rimrîma dengê lîngan hat. Min xwest ez serê xwe bizivînim lê min qewet nedît, qîrîn ji min dernediket. Tiştêkî giran bi serê min

gorrê ediland, dirk û stîrî û zuxur hilanîn, bi avê reşand, û gustilka îmaratê tede çikand:

-Ez nema hewceyî gustîlkê dibim, li welatên mişextiyê ez dê ne mîr bim.

Lê tu mayî Mîr... û gustîlk di laşê Memo de heliya. Kulîlkên hîbrê di nav destê wî de diteqin, di evîndariya êvaran de şareza ye, êvar sîbera paşerojê ne û bêdengîya mayî ya li ser rupelên zer ên kovarên wî yên pîrjimar ku belavkiribû, ne. Bi serserîti, bi tundî, giyanê wî hevrêtiya gorepana mizgeftê dîke; riha Şêx Seîd û awirên wî ên dijwar; balendeyê ku ji şaşika wî ketibû; û deng ji ne me deng bûn lê şûnşopa wan bûn... Dengên nimiz yên pevçûneke malînî, guftûgoyên ta berbangê berya weşandina her hejmarekê, bêserûberîya ku di qebwê de kombûye û pîrsa wî ya ebedî!:

-Ma gelo di seqemê de he- checîk diçin kuderê?

Hêjmareke pîr ji wêneyên he- checîkan li ba xwe hilanîbû. Û di odê de peykelek amade ye... Ge- lek caran hest dikir ku di odê de bê bask xwe li ba dîke û dema ku dixwest derkeve esman li bin

XEWN

Çirok

Nîzar Agirî

girt û kulmekî ji porê min kêşand, ez rakirim jor û hejan- dim şûnda ez berdama erdê. Êşek mezin di laşê min de derbas bû. Ez demek dirêj li erdê dirêjkirî mam, bêdeng, bêliv.

Hêdî hêdî kêzikên reş û nerm li hember min, li pey hev dimeşîyan. Li pey xwe xêzên mezeloqî dihiştin. Yek hat ku bi sînga min ve hilkişê, laşê min lerizî û ez pergizim.

Tilîyên wê bi porê min dilîst, eniya xwe dabû ser sînga min û di nav lîvên xwe de peyvên ne zelal di- got. Çavên wî şîn bûn, porê wî zer, lîvên wî tenik.

Dêya min eniya min tev- dida, bi dengêkî ne zelal dua dikir. Bang Şêşims û Memê Şivan dikir. Çaxê min lê nêrî hêşiran bi nermî rûçokên wê şilkirin. Şerpa wê ya sipî û kîtanî dişemîtî, diket ser rûyê min, li min dinêrî, dinizicî û digot: zû mezin bibe ji bo ku ez keçek xweşik, çavşîni, por zer, lîv tenik ji tere bînim.

Serê xwe bi paşde dite- wand, porê wê yê zer li nav çavên min diket. lîvên xwe yên tenik datanî ser lî- vên min. Di çavên wê de min sûretê dêya xwe didît.

guhê peykel diket... Rûdînişt û di berbangê de dengê pîrtepirta bas- kan li ser serê wî xurt dibû û den- gine mirovane gazî wî dikirin, carcaran ji wê himehima rewan ya serdema xwe zelaliya zimanê wan dibihîst. Balende wî bi esman di- nuxumand, destên xwe bilind di- kir û gazî sîberan dikir:

-Di derxistina hejmarê nuh ya kovarê de em dereng mane...

Destê xwe dihejîne, tore dibe û têt ku ji çermê xwe derkeve, ji hişê xwe kulîlkine bejî diçine û wan davêje ser neynika anuhaya xwe î pîr û distirê... Bihar e, dê hecîkî çareke dî veçerin giyanê wî, riha xwe xine dîke, dorbîneke baş bi xwe re dibe û berê xwe dide sînor, welat hust bi hust nêzik di be: Dûkel bi ser banan dikeve, çend zilam diy- ar in, subehên xwe spartine diwaran, cigarên qalind dipêçin, li tenîşt wan kuçikên mezin rami- dandî dixuyin, ew bi xwe jî bi wan re ye, çavdêriyê dîke:

-Tu mezin bûyî ey Mîr!??

Dorbîne vedigerîne çente, kese- reke kûr vedide, bi şûn de ber bi Amûda Bavê Mihemed de vedigere piştî ku agirêkî piçûk li nik çemê kevnar û Tirêna rojhilat a bilez, dada.

M. Efif Huseynî

Mîr

pîname

Azad Ehmed Elî

Kî qulên asmanan, dê bigre?
 Kî lepê xwe dê bide ber gerim-tîrêjên tavê, li welatê min?
 Pencêrên asmanan herdem vekirî bûn, li banê welatê min!
 Kî dê şapa ronahiyê rawestî ne?
 Ne cendirmên Tirkên, ne jî mixaberatên pêxemberan.
 Lehîya, lehîyên tavê hatin...
 Tenê çiyayên me bûn bergirên lehîyan, di dîroka qulkirî de...
 tenê çiyayên me bûn hêlîna pêxemberan...
 Şapeye, stûnên êgir ji qulên azmanan têne xwarê!
 Lehî ye di vê sahiya agir rij de. Kes naşê qulên azmanê banî bigirî!
 Dîse şapa ronahiyê ye li dora Cûdî.
 Dîse Tofan e li newala Dicle...
 Mirov ketine nav lepê mirovan û tu gemî nîn in, tu gemî ji nûka ji pozê Cûdî dernakevin!
 Nema qulên azmanê jorî pîne dibin...
 Gelfî jînikên spehî li Ewropa, li me negrin, dirûtina "ozon" ê ne ji karê me ye...
 Pîrekên Kurdan mijûl in, zerîyên me bi pînekirina goran ve gêj bûne, xuhdane di ber çêkirina sewikan ji girtiyên zindanan re.
 Gelfî dostên spehî li Ewropa, li me negirin, tim ozon qul bû li seranserî Kurdistanê, herdem patika cotyarên me dişewitî ji qamçiyê tavê.
 Ji mêjve, geleki ji mêjve em qelayê qula ozonê ne!
 Ji mêjve banê welatê me qul e, hemî rengên agir, hesin pij û şewatê dibarî, dibû baran li girs bêjînga asmanê me.
 Ji mêjve em evdalê atmosfera rojhilat in!
 Asman qul bûye, û ev rojên çilmisî xwe zerdikin temenên me, Mêjiyê me wek rojikê dişewitîne, qul dike, seranser kun bûye perda dil.
 Ev rojên wêran xwe nadin dest, wek pezkûvî, xwe nadin dest, dest xweşiyê, kedî nabin.
 Esmen qul e û roj bi roj em hêviyên xwe dermale dikin...
 Bi kuve, ji kîre ev roj dibezê ne xem e, ya rast ne ji bo me ye, ya xuya ev pencerên esmanan ne ji me re vedibin û wê ne ji ber reşka çavên me bêne girtin:
 Ne evîn û ne dewlet, ne mal, ne serbest... ne...
 Hîn "pîrhevok" teşîya xwe dirêse, gilokek a şevê ye, yek a rojê ye. Kurtanê "Dercêl" mirovan qetandîye, û zarokên Kurdan dê nêzik serkilên roja Qiyametê bixwin...
 Ev qul qula qiyametê ye, ne qula ozonê ye!
 qiyamet e...
 Çirokê Kurdan wînda bûn. Gundên Kurmancan li ser bajarên xelkê belav bûn. Çiya ji nûka ji xew rabûn, ser şil ji xunava hêviyan, ling keliştî ji xûnê! Ji xwîna zarokan.
 Em jî "ji xew rabûn", gelfî Kurda rabin!!
 Me xwe dît, li perê bajarekî, avêtî, şuştî, bê deng, bê çeng...
 Dîsa wek her car, me kevne stranên xwe ji bir kirin, lavij windabûn, û ji nûve em nizanin helbestan wek kesê vî bajarî bi hûnin.
 Mêranî. Serhişkiya Kurdan, me ew kir in tûrê ramyariyê, me gelek xwe tenê, bê tîr û kevan dît li gel şoreşê, ew şoreşa hîn ba û ecacok li ser kaxetê.
 Me şoreş li eniya xwe pêça, ew şoreşa hîn al...
 Me şaşikên sor jê girêdan, û girêdan û me bang kir:
 Bijî... Wek her car... Bijî...!
 Bijî tu, bijî hûn
 Bijî şikestina me ya mezin... Her bijî!
 Her bijî termên hêviyên mezin... Her bijî tu, tu yê ne çevyayî, yê şaşik ne vekirî ji eniya xwe, şaşika softiya mezin. Şaşika Eydoljiya xopan... Dîsa bijî ew stûna pola di singa we de.
 Ne şûrê neyar, ne jiyana bextyar, nemal û ne jî yar. Ne memikên li pişt tenik kirasên melesî, û ne çavên reng hebeşî, ne qesir, û ne hemî hûr xweşiyên vê dinyayê, hemî ne ketin di dilê te de.
 Canê te ma pola! Lê em çibikin canpolayê min hat zemanê pîne kirinê, hat zemanê dirûtina mezin! Ji zevîya welatê min, ta asmanê şoreşa wêran. Pînexwazê demê me, ji dergêhên şkeftan, ta qulên ozona Emerîka...
 Kî dê gorên xezanên me pîne bike?
 Kî dê bi pînekirinê ji nûka hemî dergêhan ji me re veke?
 Kî dê şûşa dilê şoreşê ava bike?
 Pîne divên ji partiyên me re
 Pîne divên ji kevin gotinên me re
 Pîne divên ji sor alayên me re
 Pîne divên ji pînen me re
 Tûj kin şûjin û derziyên xwe, mixabin: Hat zemanê pînekirinê...

Kevirê rojê -II-

Octavio Paz

Piştî derçûna ji eniya min, digirim,
 digirim lêbelê nabînim.
 Li rûyê birûskê û li rûyê bahoza ku di nav darên şevîni re bazdide, kêlîkekê digirim,
 rûyekî baranî di gulîstaneke tarîstanî de,
 avek hişk li tenîsta min diherike,
 # # #
 Digirim lêbelê nabînim, di tenhatiyê de dinivisim,
 kes nîne, roj dikeve, sal dikeve.
 bi kêlîkê re dikevim, dikevim binê-binî,
 rêçek nediyar li ser neynikan
 wênaya min a şikestî dúbare dike,
 Li ser rojina birêdikevim, kêlîkina geriyam,
 li ser ramanên sîbera xwe birêdikevim,
 bo gera li kêlîkekê ez sîbera xwe dipelçiqînim,
 # # #
 Mîna balendeyekî li dîrokek jîndar digirim,
 li roka katjimêr pêncê êvarê digirim,
 ya ku diwarên "Tizantîl" ew hênîk dikir;
 katjimêrê mêweyên wê distewandin
 û dema ku vedibûn, ji hinavên wê ên gulreng
 keç derdîçûn û li hewşên mermerkirî
 yên peymangêhê belav dibûn,
 bilind wek bejna payizê, bi rê diket,
 li jêr qenterê bi ronahiyê rapêçayî bû
 aso ew dixemiland û çermekî zêrinane î
 narî nêrî pêçkêşî wê dikir,
 # # #
 Pilingek di rengê ronahiyê de, xezalek qehwerengî,
 li ser kenarên şevê ye,
 Bi ser pencereyên barana keskinî de
 qîzekê xwe çemandiye
 qîzekê rû ciwan û piralî,
 Min navê te ji birkiyê MÎLOZÎN
 LORA, ÎZABÊLA, BÎRSÎFON, MARÎ.
 hemî rû tu yî, û hiç tu rûyek jî nînî
 hemî katjimêr tu yî û hiç tu katjimêrek nînî,
 tu di çêsnê dar û ewr de yî,
 tu hemî balende û stêrkek î,
 tu di çêsnê devê şûr û
 peyala xwîna Celad de yî,
 Ey lavlava ku bi pêş de diçe, giyan dinuxumîne,
 giyan radikşîne, giyan ji xwe ya xwe cuda dike,
 # # #
 Ey nivîsa agirîni ya li ser morikên sor,
 Ey terkên di tehtê de, ey şahzadeya maran,
 Ey stûna ji dükêlê, ey çavkaniya di kevir de,
 Ey mehrecana heyvîni, ey kûpa bazan,
 Ey dendika yanîsûnê, ey stîriya biçûk û
 bi kutayî, ku êşên bê kutayî diafrîne,
 Ey şivana rûbarên di kûrahîya deryayê de,
 Ey pasvana rûbarê miriyan,
 # # #
 Ey çequla ku ji hîmê gêjbûnê hildiweste.
 Ey gîhaya xişxişokî, ey gîhaya jehrewî,
 Ey gîhaya roja qiyametê, ey mêweya jiyane.
 Ey xanima bilûr û birûskan.
 Ey pencereya yasemîne, ey xuya li ser birînê.
 Ey qefdek gula yê ku dê sêdar bibe.
 Ey berfa Tebaxê, ey heyva sêdarê.
 Ey nivîsa deryayê ya li ser bazilê.
 Ey nivîsa bagerê ya di biyabenê de.
 Ey wesyetnameya rokê, ey hinarê ey gulgenimê.
 # # #
 Ey rûyê agiran, ey rûyekî dadayî,
 Ey rûyekî nazenîni û derd- dîtî.
 Ey saline şewpestane, rojine guroverane
 ku hemî diçin wê hewşê bi xwe û wî dîwarî bi xwe.
 Kêlîk dişewite û hemî rûyên xetîreyê yên
 bi dûhevdu de tenha yek rûne,
 hemî nav tenha yek nav in,
 hemî rû tenha yek rû ne,
 hemî sedsal tenha yek kêlîk in,
 li ser radeya sedsal û sedsalan
 du çav rê li pêşerojê dibirrin.
 # # #
 Ji bilî kêlîkekê li pêşîya min nîn e.
 Îşev, min ew bi xewnekê ji wêneyên
 tevlihev di xewnê de guherandiye,
 wêneyên ku bi dijwarî di xewê de kolayî ne,
 ku ji neyîna vê şevê rakîşyayî ne,
 ku bi hêza bazinê dest, tîp bi tîp, bilindbûyî ne,
 lê belê li derve kat gurr dibe
 û Cîhan bi katkirina xwe ya dirindane
 li dergêhên dilê min dixîne,



Octavio Paz dibêje:

Helbest giyanê nihênî yê jiyana rastîn e.
 Em dikarin bêjin ku wek softiyê ye. Çinkî helbest li derveyî naverok û tîrma xwe bê şîrove dimîne.
 Helbest şîrovekirina xwe di peyvê bi xwe de dibîne.
 Bêdengiya ku me dorpeç dike bi helbestê dest pê dike.
 Bi peyva rastîn hemû peyvan pêşkêşî me dike.
 Lewra pîr zor e ku em bişên di şûna peyva helbestî de peyveke dîtir bi dest xînin û nakokiya di navbera peyva helbestî û peyva pexşanî û ya di zimanê rojane de ji vêya tê.

Helbest çavkaniya hemû berhem û nivîsarên min e.
 Ez bi xwe ji wan helbestvane me yên ku ligel helbestê guhdidan rexnegiriyê, hunerê, muzîkê wek Bodlêr, Valîrî, Brîton û Elyot.

Hemû xelkên cîhanê guhdidin xewn û xeyalên me, em xelkên Latîn Amerîkayê. Gelek caran danûstendîne bi me re dikin mîna ku bi zarokan re bikin.
 Lewra ez pîr serbilind im ku Akedemiya Swêdî xelata Nobel diyarî min kiribû ne ji ber ku ez tenê helbestvan im lê ji bo ku ez rexnegir û ramyar im jî.

SERESKERÊ CEPHÊ XARPÊT-PALÎ: YADO

Seyîtxan KURÎJ

Tarîxî Kurdistanî modern daha zaf tarîxî şerrûnî bînatê gelî Kurdistanî û dewletî kolonyalistûn û. Rewna gelî Kurdistanî qoxe û xebat kenû ki kolonyalistûn 'erd xwi ra berzû teber û welatî xwi di xwi îdare bikirû. Gelî Kurdistanî binî serokatiya Mîrî Botan Bedirxan Begî di, binî serokatiya Şêx 'Ubeydullah Nehfî di, Yezdanşêrî di sare darit we, waşt ki Kurdistan bibû xwiser, la çi fayde ki duşmen hêna xwirt bi, inay ra Kirdûn nişka duşmenî Kurdistan ra vecî.

Cuwa pê 1920 di Qoçgîrî di, 1925 di binî serokatiya Şêx Se'îdî di, 1937 di binî serokatiya Seyîd Rizay di huncî gelî Kurdistanî sere darit we. Îta di waştîşî mi nuştîşî tarîxî Kurdistanî niyo. Ez wazena behsî Yadinî Cebaxçurîci (Yadî Begûn) bikira. Gelî (şarî) miyûn di Yadin ra Yad Mehmud 'Ebas yenû vatiş. Yad Mehmud 'Ebas, serrê şerrê Şêx Se'îdî di serokleşkerî Cephê Xarpêt-Palî bi.

Yadin bi xwi Çewlîgic û. Çewlîg ew wext merkezê mintiqay Cebaxçurî bi la zerrey derî di cayêkû qicik bi. Bacê (be'dî) Hukmatî Cumhuriyetî nûmey îtay bedilna, kerdî Bingöl. Cumhuriyet ra ver îdarê Çewlîg key Mutelîyûn (Mutewellîyûn) destî di bi. Key Mutelîyûn, 'esil xwi Çewlîgicî bî û yew keyew Xûnedûn bi. Yadin zî Çewlîgî di "zabit katibî" bi. Cinîyey Yadin, dewey Çebaxçur Qeldar ra bî, nûmey ya Tellî bi. Tellî key Ezîmşêr ra bî û di biray yê bî: Mehmud û Şerîf.

Waxto ki Serekê Partiya Azadî Xalid Begê Cibri û Yusuf Ziya Bedlîs di per hukmat ra yê girotiş, hukmat Şêx Se'îdî ri xeberî şawenû, vûnû "Yew îfadê tû estû, biye îfade bidî". Şêx Se'îdî unîyey weziyet xirabin û, werzenû we û Kurdistan ra gêrenû. Hê ver yenû Çewlîg, dewê Çûn û çend dewûnî Darahênî di dewicûn ûnû pye seri. Îta di halê Kirdûn û Kurdistanî seri qîşê kenû, vûnû Kemalîstûn bêbextê kerda ma, qol (qewlê) xwi ca niardî, êr (ewro) vûnî Kird û Kurdistan çînî, herkes Tirk û. Hîn sarewedartiş ma seri biyû ferz. Yad zî miyûnî inî cemaatî di hedre benû, Şêx Se'îdî di qîşê kenû.

Çewlîgî di mensûbî partiyê Azadî bî. Inin ra Teyîb 'Elî, bînatê Erzurumî û Amed (Diyarbakir) di quelçiyê kerdîyênî. Erzurum ra xeber berdiyeni Amed, Amed ra berdiyeni Erzurum. Yadin serkote Şêx Şerîf, Şêx 'Evdilay Melekûnî zî Şêx Se'îdî hetî bi.

Bacê Şêx Se'îdî şinû Pîrûn (Pîran). Qêdo ki yenû zûnayîş Pîrûn di provokasyonî hukmatî ser ra, şerrê Şêx Se'îdî dest pê kerd. Sibata 1925 di Kirdûn Darahênî kerdî paytext. Per bîn ra Şêx Şerîf û Yado dewûnî Cebaxçur û Palî ra gêrenî, herçî camiyerd o,



Yadê Began

Şêx Şerîf berpîrsiyarî siyasî Cephê Xarpêt-Palî, Yad zî berpîrsiyarî leşkerî (eskerî) Cephê Xarpêt-Palî bi. Şêx Şerîf miyûnî dewûn ra gêriyan û qîşê kêrdiyen, dewicî de'wetî şerrî kerdîyeni. Yadi zî cephe di şerr îdare kerdîyeni.

pyerin genî binî silehî.

Şêx Şerîf berpîrsiyarî siyasî Cephê Xarpêt-Palî, Yad zî berpîrsiyarî leşkerî (eskerî) Cephê Xarpêt-Palî bi. Şêx Şerîf miyûnî dewûn ra gêriyan û qîşê kêrdiyen, dewicî de'wetî şerrî kerdîyeni. Yadi zî cephe di şerr îdare kerdîyeni.

Şêx Şerîf û Yadin pîya leşkerûnî xwi ya hefî Cephê Xarpêtî ya şinî. Hê ver erzenî qerequeli Guluşkur seri, inî qerequeli bînatê ra darenî we. Xarpêt ra xêlek leşker yenû yin ser. Yi û leşkerî Tirkûn nizdîyê Xarpêt di, dewê Qung di raştî yewbinî yenî. Îta qoxe xêlek dom kenû. Leşker û cepxanê Tirkûn êy Kirdûn ra zafêr û, la huncî zî Kirdî zorî Tirkûn benî û şunî Xarpêtî genî. Îta Şêx Şerîf dewê Huseynîki di şinû kêy Hesen Xeyrî Derşimîci, wi û Hesen Xeyrî pîya Seyîd Rizay ri yew telgraf şawenî, vûnî şima terarêk xwi vîniyen, ma nizdî ra yenî ziyaretê şima. Inî waxt binî Xarpêt di, Huseynîki di depoy eskeriya teqenû, xêlek însûn mîrenû û îta Kirdî binê xwi şaş kenî. Şêx Şerîf û Yado zaf xebitenî ki Kirdûn sakîn kirî, la binê telefata benû.

Hukmat Meletî ra leşker şawenû Xarpêtî ser, kuwenî Kirdûn dima. Suki di Kirdûn tepişen û nûnî hukmatî lap a.

Kirdî mecbur mûnenî xwi têpiya hêt Palî ya ûncenî. Deştê Palî di bînatê leşkerûnî Tirkûn û Kirdûn di qoxê girdî benî. Kirdî xwi deşt ra hêt koyûnî Cebaxçur a ûncenî. Nizdî Çewlîgî di Boxazê Mendoyî di Yado û pêşmergey xwi vernîya leşkerî Tirkûn genî. Îta yew ruc qoxe dom kenû. Yad yew firqay Kazim Paşa'y genû çember, yi him-hima ki teslîm benî, la pê ra quwetî Necîp Axay Wexî resenû îmdadî Kazim Paşayî, yin xelesnenû. Yadin û xêlek pêşmergey xwi resnenî koyûnî Cebaxçurî.

Leşkerî Tirkûn kûm dew ra veriyen se merdimûn kişenî, bûnûn vêşnenî; xelûn, vaşûn, zadê dewicûn vêşnenî. Yew qefla leşkerûn şinî dewê Cebaxçur Kur seri. Dewicûn ra vûnî "Bêriyen dest, ma qarişî şima nibenî". Dewi di yew eskero teqawitbiyaye beno, ewi vûnû "Bêriyen dest, ez vûna wa qarişî şima mebi". Yew qîşimî dewicûn bawerê xwi pê ûnû, yenû dest. Leşkerî Tirkûn inin genî, tê (tey) benî. Riye ra inî 32 tenûn pê sungîyûn kişenî. Mezeli tûnîni belî, tûnî zî çö (çew) nizûnû mezeli yin hûnî yo ça. Yadin û umbaz xwi Mihê 'Evdê, Hesê Begûn, Husê Begûn, Mihê Qilc, di vistorê Yadinî: Mehmud û Şerîf Ezîmşêr û eyî bîn dewomî şerrî çekdarî kenî.

Yado quwetî xwi tenzîm

kenû. Roc koyûn a xwi nimnenî, şew erzenî qerequeli ser. Dewicî yin hukmatî ra pawenî, nûn û okê (awa) xwi yin di bar kenî. Umbazî Yadin piyeri zî peyê vîcnayê bî. Hêt Cebaxçur û Palî di nûmey yin êri zî yenû vatiş. Vûnî tîfingû ki yin eştiyen, mirçik ver ra nixelîsiyaynî. La tûn umbazûn yin waxti go Yad pa mebiyen heqaret kêrdiyeni dewicûn. Yadin biesnawitîyen neheqê qewil nikerdiyeni. Leşkerî Tirkûn nieftiyayin yin dima şuerî, direkt yini di qoxe bikirî, la heqaret kêrdiyeni dewicûn.

Rucêk şinî yew dewê Depî (Karakoçanî) di propaganda kenî û dewicî ci ri wer (werd) ûnî, çend umbazî yini dûmarê dew genî, dew pawenî, êy bînî nişenî rue û nûnî xwi wenî. İna heli di cendirmê erzenî dewi seri. Dewicî xebiri dîni Yadinî, vûnî leşker ame. Yadin vûnû "Taway nibenû, nûn xwi burîyeni". Nûn xwi wenî, bacê tîfingûnî xwi genî û wirzenî, yi û leşkerî Tirkûn tîfingûn nûnî yewbîn a. Şerr xêlek dom kenû, Yadin imbazûnî xwi ra vûnû "Mi bipawiyeni, ez yew perr ra cephe kena a". Umbaz yi yi pawenî, wi nûnî leşkerûn a, yew cephe qelişnenû û umbaz yi pyeri ewca ra yi dima şinî, bye telefata xelisiyenî. Leşkerî niftûnî yin dima şuerî, la heqaret dewicûn kenî. Dewicûn ûnî pye ser, kuwenî, kişenî, vûnî şima nûn dîni eşqîyayûn, şima yin nimnenî.

Rucêki zî şinî warê dewa Kur (na dew ra 32 tenî şehîd bibî). Îta di dewicûn di sohbet kenî. Yi ware ra şinî, bacê leşker yenî ware. Leşker dewicûn ra vûnî "Eşqîyay ki amê ita hê y ça?" Dewicî vûnî "İta ra şî, hûnî ini koyûn a". Leşker niftûnî yin dima şuerî la heqaret dewicûn kenî, vûnî şima qê ca dîni eşqîyayûn û camiyerdûnî warî genî tê benî.

Yad û umbazî xwi zimistûnî şinî Binî Xetî (Sûriye). Ew waxt Sûriye binî bondiray Frensizûn di bî. Frensizî Yad û umbazûnî yê ra silahûnî yin wazenî. Yad vûnû "Silahî ma namûsî ma yo, eger ma silahî xwi bidaynî ma niameynî ita. Ma silahî xwi niday Tirkûn, ma nidûnî şima zî". İnay ra Sûriye di zaf nimûnenî, wisarî hêna gêrenî a, yêni Kurdistan.

Yad û umbazî xwi nizdî di serrî koyûn a gêrenî. Cinîyey yi Tellî xeber şawena, vûna "Ez zî wazena şima ya bigerî". Yado û birayûnî Tellî ra Şerîf û Mehmud yew şew şinî dewê Tellî Qeldar, ita ra Tellî zî genî tê benî. Tellî xwi bestena tye ri, kincûn gena pirayî, 'egal bestena xwi sare ya, gijîki xwi kena binî 'egal, cizmûn kena pay, di rextûn çapraz bestena, tîfing kena xwi queli ri, nişena astuwar û yini di şina. Tellî zî yin a xêlek zemûn gêrena, leşkerûnî Tirkûn di şerr kenî. Tellî zafê camiyerdûn ra daha hol tîfing erzena.

Zemûnek cuwa pê bînatê Darahênî û Licê di, koyûnî hêt Mistûn-Botiyûn a yew mifrezê leşkerûn kuwenû yin dima. Bînatê leşkerûn û yin di qoxe dest pê kenû. İni qoxe xêlek dom

kenû. İta di Tellî bena birîndar, quwet ra kuwena, hin nişkena şiyeri. Yado umbazî xwi Mihê 'Evdê ra vûnû "Şuwe, eger darbê yay girûn a yanî xelisiyayîşî yay mumkun niyo se, ti tîfing pani bikişî, wa destî duşmenî mekurû." Mihê 'Evdê şinû Tellî ser, uniyen ki darbê yay girûn a, xelisiyayîşî yay mumkun niyo, mecbur mûnenû, tîfing nûn pa, kişenû û ca verdûnû yenû. Yad û umbaz yiyî bîn xwi hêdî hêdî têpiya hêt koyûnî Darahênî ya ûncenî. İta di bînatê yin û leşkerûn di şerr dom kenû. Umbazî Yadi Mihê 'Evdê benû birîndar, Yad û umbaz yiyî bîn xwi xelisinenî şinî.

Mihê 'Evdê xwi uca nimnenû, yew leşker yenû yi vînenû la taway pê nikenû, yew querrî (qorrê) fişekûn zî dîni ci û veriyenû ra. Mihê 'Evdê şinî di tarî di ewca ra wurzenû û şinî yew dew. Dewicî yi nimnenî, darbê yi dari kenî. Mihê demêk ewca mûnenû, bacê yenû kîye, 1960 a pê mîrenû.

Umbazûn yin ra Hesê Begûn şinî teslîm hukmatî benû, hukmat tîfing dîni Hesê Begûn, yi kenû milîs. Hesê Begûn aw ruc ra têpiya kuwenû umbazûn xwi dima.

Yad û umbazê xwi yî bîn şinî benî vîni. Hetûn êri (ewro) zî çow qet nizûn se ra şî, pê se bî. Veteriner Dr. M. Nûrî Derşimî, kitabê xwi "Kurdistan Tarihinde Derşim" di nusenû ki Yado û umbaz xwi şî Sûriye, la cuwa pê pê se biyû ma nizûnî.

PASÛR (KULP) RA YEW DEYİRÎ:

HEROY LOY

Arêkerdax:
M. LICOKIC

Herê m' şî serê kerrî*
Heroy loy lo, heroy lo
Hewniyayne deşt û berrî
Heroy ley lo, xilfeko

Herê m' 'erd ro genawo
Heroy loy lo, heroy lo
Hîrê vengî zirrawo
Heroy ley lo, xilfeko

Dindanê herê m' rişyayê
Heroy loy lo, heroy lo
Keyney vanê: "Mircan ê."
Heroy ley lo, xilfeko

Pîrî vanê:
"Simî[herî] fincan ê."
Heroy loy lo, heroy lo
Pîrî vanê: "Simî fincan ê."
Heroy ley lo, xilfeko

Herê m' reyîsê Tirkan o**
Heroy loy lo, heroy lo
Vet fermandê Kurdan o
Heroy ley lo, xilfeko.

*Ena dêre dewanê Pasûr (Kulp)'î ra Herta, Sîmsor û Deyas di vajiyêna, mi fekê F.î ra şinawita (eşnawita).

**Etiya di "reîsê Tirkan" ra meqsed İsmet İnönü yo.

Hendirên...

gewde bûne, ji xwe ew şêwe xwe bi xwe kuştina hunerkarî û giyanê romanê ye.

Be herhal, eger îro bi rêça wergerandinê em kêr agahdarin ji romana navnetewî jî. Em dikarin bêjin: Ku romana Kurdî di qonaxa çarpiyan de ye. Di gel vê jî, eger em romanên ku vê dawîyê hatine nivîsandin bi herdû çîrokên dirêj a CEMİL SAYIB (li Xewma) û a UMER MUXTAR CAF (meselî wîdanî) mûqarene bikin (digel ku herdû çîrok ji mêjve hatine nivîsandin) em dikarin şêwe û qolayî û dinya-bîni bi wê dema cuda û dirêj re bipîvin, em dikarin bêjin ku giraniya kefa tarezûnê dê bi wî alî de dakeve. Babet û şêwe û teknîka ku di wan herdû çîrokan de bi gewde bûye û di salên 20 î de hatine nivîsandin, ger em mûqarene bikin em dişên bêjin ku îro romana Kurdî zor li paşe.

Ta îro jî, pîrbûna rûpelan li ba me mercên romanê dinasin. Merc, nişanên ekademyên romannivîsînê hêjî têkçûyî ne. Lewra em dibînin sedemên ku çîroknivîsan dehfdaye ku romanê binivîsin, ne pirsyara felsefa romanê bûn. Belkû çend pirsyarên rojane î derveyî û xwe bi xwe, ev jî ji kêr

zanîne tîn, di guftugoya wan nivîskaran de bi xwe durust bûbûn, wek;

- Bo her û her Kurd helbestê dinivîsîne, roman diyardeyek şaristanî ye, helbest amadeyî nemaye û helbest nikare barên giran hilgire...?!

Li jêr bandûra van bareyên (haletên) ne guncînane, zorbeya çîrok-nivîsîn ku ji mêjve çîrok dinivîsandin dest bi romanê kirin. Bi vî awayî roman hat meydanê. Mîna ku bi nivîsandina van romanên me şaristanî anî gorepanê û me ne şaristanî bin ax kir. Îca Kurd jî bûn xwedî roman lê kîjan û çî roman?

Bêguman di vê hevpeyivînê de cîh nîne ku em dîr û dirêj li ser hebûn û nebûna romana Kurdî bipeyivin. Lê dîse, bi kurtî ez dibêjim; ku, peyivîna li ser romana Kurdî hewcedarî rexnegirên ku bişên li ser sîfê û mercên peydabûna romana Kurdî rawestin, her weha bidin xuyankirin ka gelo taybetmendiyên romana Kurdî çine? Ango zimanê romana Kurdî dikare pirsên bingehîn ên nasname û dîrok û keşafîya me durut bike? Çinkî rehên romanê digêje rewşa aborî û siyasî û civakî û

şaristanî ya miletan. Îca ev çend romanên ku li ser tîfîyên destekî tîn hejmartin me dehfdidî ku em bêjin:

Civaka me ta nuha jî di seretayî û zaroktîyê de dijî. Bi vê wateyê, peydebûna romanê bi şêweyekî giştî nişana têgihîştin û kamîlbûna gelan e. Vêce romanên ku anûha li ber dest in ku nikaribin dîroka şikestina me berceste bikin, wê wextê, em dikarin bêjin ku zimanê romana me li beramberî bigewdekirina şikestina me radest e. Di bawerîya min de ku ew şikestî bi zimanê Erebi hatiye destnîşandan bi teybetî di herdû romanên S. Berekat de, "Perk" û (Leşkergehên Ebedîyê) Bi zincîra romanên Selîm Berekat em dikarin li beramber dîroka şikestina xwe-wek milet-rawestî, vêce eger em bi xwazin wê şikestî pîrozmend bikin gereke wek wan romanên S. Berekat ku bi Erebi hatine nivîsandin, gerek bi Kurdî bîn nivîsîn. Dema ku romanek wisa hat nivîsandin, an jî zimanê Kurdî ew pirsên felsefî di xwe de bi cîh kirin, em dikarin wê wextê jî serpehatîyan derbiçin ber bi romanê de.

Ewrûpî rabûn ser...

ve hat rûşkirin. Hukûmetên Ewrûpayê li ser rakirina immuniteta parlamentera Tirkîyê rûş kir.

Qerara parlamentoya Ewrûpayê

Bi taybetî serokkomarê Fransayê Mitterand li ser rakirina immuniteta parlamentera DEP'ê sekîni û di vî warî de xebateke pîralî kir û pêşniyar ji Parlamentoya Ewrûpayê re bir ku ew bi qerarekê wê helwesta hukûmeta Tirkîyê bicirmin.

Parlamentoya Ewrûpayê di civîna xwe ya 17'ê Adarê de bi 212 dangan (3 deng li dij derketin) qerar stendin û ew şêla hukûmeta Tirkîyê rûşkirin. Parlamentoya Ewrûpayê bi rûşkirina hukûmeta Tirkîyê tenê nema herwisa ew jî hukûmeta Tirkîyê daxwaz kir ku mafê otonomiya Kurdan qebûl bike. Parlamentoya Awrûpayê qerara ku li dijî demokrasiya plûralizmê hatiye stendin rûş dîke û serbestberdana parlamentera daxwaz dîke.

20 parlamentera Swêdî jî ji Serokê Meclîsa Tirkîyê Husamettin Cîndoruk re namemek şand û daxwaza vegereandina immuniteta 6 parlamentera DEP'ê kirin.

Wezîrê Dervê yê Fransayê yê kevin Ronald

Duma wê abûqatiya parlamentera DEP'ê yên ku immuniteta wan hatine rakirin, bike. Duma wê meselê bibe Mahkema Ewrûpayê Ji bo Mafê Mirovî.

Hêzên Kurd Tirkîyê rûş kirin

Hêz û partiyên Kurdistana bakur him yek bi yek him jî bi hev re belovak derxistin û rakirina immuniteta parlamentera DEP'ê protesto kirin. Komîteyên Hevgirtin-PDK, KAWA, PKK, PRK (Rizgarî), PRNK, PSK, RNK-KUK, Têkoşîna Sosyalîst, TSK û YEKBÛN yên Swêdê bi hev re daxuyaniyeke çapemenî dersxistin û dewleta Tirkîyê protesto kirin.

Di daxuyaniye de tê gotin ku "her Kronek hûn wek turîst li Tirkîyê dihêlin, her alîkariya ku hûn dikin, dibe çek û berê wî dikeve gelê me û dibe sedemên cinayetên nuh".

Tirkîyê guh nade Ewrûpiyan

Qerara Parlemantoya Ewrûpayê hukûmeta Tirkîyê kir zorê û şeklekê siyasî da mesela Kurdî. Li ser vê qerare hukûmet û muxalefeta Tirkîyê gelek aciz bûn û gotin ku "ev daxulê karê me yê hundirin e".

Lê êdî tîr ji kevanê

derketiye. Hukûmeta Tirkîyê çî bike bila bike nikare li hember Ewrûpiyan Kurdan înkâr bikin. Lê îro qozeke tenê destê wan de heye ew jî qoza PKK'ê ye. Hukûmeta Tirkîyê bi zanetî mesela Kurdan bi PKK'ê ve girê dide û meselê wek mesela terorizmê nişan dide.

Mesaja agirberrînê

Di konferansa Navneteweyî ya ji bo bakurê Kurdistanê ku di 13'ê Adarê de li Brukselê civiyabû û jî aliyê Medico International û Projeya Mafê Mirovayî ya Kurdistanê hatibû organîzekirin, Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Ocalan mesajek şand.

Di mesajê de Abdullah Ocalan dibêje ku dewlet hazir be bi me re rûnê, em hazir in agirberrînê îlan bikin û "dîtineke me yê ku em Tirkîyê perçe bikin tune".

Lê ev mesajê Apo ji aliyê Serokkomar û Serokwezîra Tirkîyê ve bi şiddet hat redkirin û gotin ku em bi "çeteyên terorê re" rûnanin û ev ne mumkun e. Careke din ev mesajê Abdullah Ocalan di nav toz û dûmana rojeya Tirkîyê de çû hewayê û di medya Tirkîyê de zêde cî negirt.

Lewend Firat

Rojeva Mehê

Destpêk: r.2

mîlîtarîst de berdane. Siyaseta ku di vî warî de dimeşînin her wê siyaseta nijadperestî û antî demokratî ya siyasiyên berî wan e. Bi xwe wana tu siyasetek nuh neaniye, ya kevn jî pir bi nezani dimeşînin. Loma jî xeta mîlîtarîst, mesrefeka gelek giran xistiye ser hustuyê dewletê, teror û kaosa ku di netîca vê siyasetê de peyda bûye, warê industrî, zîraî, tucarî, turîzm û gelek herêmên din de roxandinek bi xwe re aniye, jiyane û dînamîzmê pûç kiriye. Bêkarî, warwêranî û koçkirina ku hatiye netîca xeta siyasî ye. Li Tirkîyê ne wek şexs ne jî wek partî kes tune ye ku bi mîrxasî rabe bêje, ezê rê li ber vê çûyîna bê ser û ber bigrim û dest bi reformên siyasî, civakî û aborî bikim. Mîrxasekî bi mana serokekî xwedan alternatîf û bi qerar ku, hustu ne li mîlîtarîstan ne li nijadperestan û ne jî li muhafezekarên nîzamiyê rêvaçûna îroyîn xwar bike.

Ne ku Tirk tenê bi rast û çepên xwe di siyasetê de perçe, bê îstîkrar, bê alternatîf û bê serokayeti ne, rewşa Kurdan bi set qatî jî yên wan belengaztir e. Siyaseta ku îro li Kurdistanê heye hew ew siyaset e ku PKK'ê bi rabûna xwe ya çekdarî ya hişk heta îro aniye. Îro ew jî hatiye li derekê asê bûye, dengê wê heye lê berbi çareserkerinekê ve tu berhem lê peyda nabî. Di ser re jî bi wê siya xwe ya ku li seranserî welêt peyda kiriye nahêle ku tu berhem rû jî bidin. Siyaseta DEP'ê ya di dewra kampanya hîlbijartinê herêmî de, nişaneke eşkere ya belengaziya siyaseta tevgera Kurdî ye. DEP jî ber ku ne xwedan serokatîyek serbixwe, zane û bîmesuliyet bû wekî bûyerên civakî yên dinê di hîlbijartinan de berê bêdeng û bêsiyaset ma, piştê jî di demek ne di cîh de biryarek şaş da ku nekeve hîlbijartinan. Bi vê yekê cara pêşîn e ku qada civakê û mûsesên sîvil yên herêmî li Kurdistanê li ber partiya Erbakan û ya Turkeş bi vî firehiyê vebûn. Miletwekiliyên DEP'ê jî parlamentoyê hatin avêtin, tu dengêkî ciddî ji DEP'ê û jî Kurdan derneket. Di ser re jî meş û pevçûnên hevalbendên PKK'ê yên li Almanayê tesîra wê derba giran li ber çavên biyaniyan daxist sifirê.

Di hîlbijartinê herêmî de yên ku herî bi paş de ketin û zerar dîtin Kurd bûn. Bilindbûna rayên Refahê jî di dema pêşîya me de wê bibe bûyereke welê ku, hukûmetên Awrûpî û yên Amerikayê pirtir alîkariya, partiyên ser hukum ên Tirkîyê bikin, tawîza bidin wan, li hemberî êrişên wan ên ser Kurdan bêdeng bimînin.

Bi kurtî ev e rewşa siyasî ya Tirkîyê, bi Kurd û Tirkên xwe û bi çep û rastên xwe. Heke rewşa aborî berdevek be û teqîya be, ya ku bendav teqandîye û hê ku dihêle wek lehiyekê ev av serobîni hev bibe siyaseta Tirkîyê ye.

Biryar û tercihên siyasî û bizzad perçebûn, qelsbûn û belengaziya wê musebibê wê rewşa Tirkîyê ya giran e. Heta ev tespît neyê dîtin û di vî warî de tişteke neyê kirin, ne derdê aborî ne jî yê civakî çareser nabe, Tirkîyê bi Kurd û Tirkên xwe berê xwe nade ronahî, xweşî û firehiyê.

Boykota DEP'ê kêrî...

Partiya DYP'ê ji li Mêrdînê seroktiya Belediyê girt.

Herçiqas di hîlbijartinê berê de jî bajarên Kurdistanê, wek Elazîg, Erzîncan, Mereş û Sêwasê partiyên faşîst û îslamî herî zêde rey digirtin jî di vî hîlbijartinê de ew partî bi taybetî jî Partiya Refahê hin reyên xwe zêde kirin û bajarên din yê Kurdistanê hîlbijartin qezenc kir.

Tevî ku dewletê bi her awayî rê lê digirt ku DEP nekeve hîlbijartinan jî, encamên hîlbijartinan xuya kirin ku biryara boykotê şaş bû. DEP partiyêke legal bû û bi vî manayê partî û rêxistin jî bo hîlbijartinan hene. Lê wek tecruba HEP ê, mixabin rêxistinên Kurdan rê nedan DEP jî bibe xwedî şexsiyeteke serbixwe, ne bi beyan û îşaretên aliyên din tê-

keve qada xe-batê. Ji bo PKK ê jî biryara boykotê dewama mantiqê qedexekirina kovar, rojname, partî û xwendina bi Tirkî bû. Lê wek biryarên berê, biryara boykotê jî bi ser neket. Ji ber ku bi her awayî jî civaka serdest qetiyar

hêz û rêxistin dixwaze. Bi boykota hîlbijartinan gelê Kurd bê alternatîv ma, partiyên Tirkî bi destxistina be-lediye û cihên din, bi qayimkirina rêxistinên xwe li gund û bajarên Kurdistanê piçekî di cihên xwe xweş kirin.

Pirozkirina du saliya

Yekbun'e



- ◆ Şivan PERWER
- ◆ Tehsîn TAHA
- ◆ Fûad EHMED
- ◆ Zahid Brifkanî

- ◆ Axaftin
- ◆ Slayt
- ◆ Folklor
- ◆ Def û zirne

Cih/Plats : Konserthuset (T) Hötorget
Dem/datum: 13/5/1994
Saet/tid : 17.00

Kultur û Polîtîka

Riza Polat

Taktîkên Pehlewan Ferman

Pehlewan Ferman ji bona ku çî kesek di guleşê de, piştî wî li erdê nexê, rêyek dabû pêşîya xwe. Heroj golika çêleka xwe sê cara hildigirt ji pêlekana hildikişîya û dadiket. Ewî hetani golika wî bû conega û dûre bû ga jî ew karê xwe domand. Pehlewan Ferman ji dereca hilgirtin û himbêzkirinê golikê xurt bû ku bikare êdi ga hilgire û himbiz bike. Heger Pehlewan Ferman ji roja pêşî dest pê bikira ga bihilgirta û himbêz bikira, ne diyar bû ku wê di karê xwe de serbiketa. Lê tiştê ku eşkere û diyar ew bu ku Pehlewan Ferman piştî demekê gehiştê wê taqetê da ku bikaribe ga bihilbigre, ji pêlekana hilkişê û dakeve.

Siyaset û jiyana siyasî jî wek xurtbûn û pêşketina Pehlewan Fermane. Mirov nikare di her qonaxa tekoşinê de eynî taktikan û siyasetan bide pêşîya xwe. Ew taktikana û siyasetene li gor xurtbûn, qelsbûn û pêşketina tevgera mirov e. Ji bono vê jî , di terolojîya siyasî de ew hewcedarîye bigotina siyaseteke waqî û ne waqî, siyaseteke di ci de yan jî di ne ci de hatiye ifadekirin. Carna dibe ku pirtûkên teorik ber bi aqil biçin lê di jiyane de ne taktîk û siyasetên waqî bin. Çûnkî di jiyana siyasî de rêçete li gor pirtûka nayê nivîsandin.

Gelek kesan gotîye, di siyasetê de heger hinek norm, prensib û kriter neyên karanîn, pirtûkên teorik dibênin, yan jî dibêjin mirov pêwîste xudanê siyaseteke waqî be. Lê di jiyana siyasî de, mirov nikare herwext wê momentê dest bixe. Çûnkî ewye jî maharetê dixwaze û rêçetên hazir ji tune ne. Siyaseteke waqî li ser hizbûn û tewazina hêzên der dora mirov tê avakirinê û bejn dide.

Gava ku mirov li wan 15 salên dawî yê tewgera Kurd dinêre, mirov baş dibîne ku di jiyana siyasî de tecrubeyên dirokî çawan roleke ronikîrî dilîzn. Di wê manê de çend mînakên balkêş di tewgera gelê kurd de hene. Di sala 1979 'de meha tebaxê li Îranê rejîma meleyên paşverû êrişeke dirandene ajot ser Kurdistanê. Di wê demê de hinek bajêrên rizgarkirî destê Partîya Demokratîk a Kurdistanê Îranê de hebûn. Piştî wan êrişên hov, dîrê li pêşîya serkirdayetiya partîyê hebû; yan wê ew bajêr biparastina û li bajar berxwe bidana, yan jî wê ji bajaran bikişîyana û bajar berdana, serkirdayetiya partîyê rêya duyemîn a ku li gor taqet û hizbûna wê bû da ber xwe.

Li Kurdistan'a başûr serê adara 1988'an de, Yekîtî Niş-timanê Kurdistan taktikeke ne waqî û ne di çî

de da pêşîya xwe, taktika rizgarkirina bajaran. Yek ji wan bajaran jî Helebçeya di dilê Kurdan de wek Hiroşima tê bîr anîn bû. Sadam , piştî rizgarkirina bajêrê Helebçe li kurda hat xezebê, agirê mirinê li ser kurda barand. Lê, di payiza 1991 'de rizgarkirina bajêrê Sûleymanîyê (Wek tê zanin Sleymanîye ne di parçelela 36 'de ye) siyaseteke di ci de, li ser qûweta xwe û der dorên xwe hatî pîvandin bû. Çûnkî Partîya Demokratîk A Kurdistanê di wê meselê de dudil bû. Nedixwest di merhela giftûgoyan bi Saddamre bûyerên defakto rû bidin. Lê hesab û taktikên Yekîtî di jiyane de rast derketin.

Minakeke ku mirov pê-wîst e li ser bisekine û munaqesha wê bike, biryara qedexekirina partîyên Tirk bu. Li Kurdistanê bakur, di meha îlonê de poliûtîkaya PKK 'ê ya qedexekirina partîyên tirk siyaseteke bexwest û ne di ci de bû. Hinek Kurdan pêştî wê biryarê êdî xwe di neynika dêw de dîtin û hinek kurdên ku bi hîsên xwe fikirin sempatiyek ferah ji wê biryarê re nişan dan.

Dewleta Tirk ew biryare ji xwere kire hicet û li Kurdistanê, pîvana terora xwe ya dirandene bi her awayî bilind kir û bikaranî , terora xwe gihand wê nuxtê ku DEP'ê nekarî li Kurdistanê li hinek cihan namzatên xwe ji bo serokatiya belediyan diyar bike. Gelo ma ne dem e êdî mirov taktîk û hesabên xwe li gor taqet û rewşa der dora xwe bike.

Lê piştî fêtrekê di diyar bû ku ew siyaset li gor hizbûna xwe û a dijimînê xwe nehati bûpîvandin. Bê şik dema tasfiyekirina hemû hêz, muese û cihazên dewleta mêtîngehkar jî heye. Biryar û taktikên wiha li ser esasê hizbûna mirov û qelsbûna dijimîn dikeve rojeva mirov. Îro li Kurdistanê piştî wan pêşketinên dawîyê, diyar bûye ku taktikên bê wext taqetê di gelê Kurd de nahêle

Dewleta Tirk ew biryare ji xwere kire hicet û li Kurdistanê, pîvana terora xwe ya dirandene bi her awayî bilind kir û bikaranî , terora xwe gihand wê nuxtê ku DEP'ê nekarî li Kurdistanê li hinek cihan namzatên xwe ji bo serokatiya belediyan diyar bike. Gelo ma ne dem e êdî mirov taktîk û hesabên xwe li gor taqet û rewşa der dora xwe bike.

Xeleti; Di hejmara berê de hevo-ka duyemîn a paragrafa heştan bixeleti hatiye nivîsandin. Xeletî; "Wek tê zanin berê li diyarê mirov bi navê bajarê xwe jî xeribîyê dihat bi nav kirin". Rastiya wê wiha ye; "Wekî tê zanin berê li diyarê xeribîyê mirov bi navê bajarê xwe jî dihat bi nav kirin".

Li Kurdistan'a başûr serê adara 1988'an de, Yekîtî Niş-timanê Kurdistan taktikeke ne waqî û ne di çî

BEROŞ

Mahmûd Lewendî

REPORTAJEK

Bi nivîskar Rojnamevan Dengbêj MÎM GALAKSÎ re

MÎRKUT: Ez benî, zatê te di çî kafî de û li ku dera Kurdistanê jî dayik bû?

GALAKSÎ: Biyografiya min bixwîne!

MÎRKUT: Ez benî, zatê we dikare piçêkî qala malbata xwe bike?

GALAKSÎ: Diya min ji mala Mîrê Hekkarîya ye, bavê min jî ji mala Begzadên Hewlêrê ye. Bapîrên min di dema dewleta 'Usmanî de li Diyarbekirê li taxa mala Cemîlzadeyan bi cih bûn.

MÎRKUT: Mîrê min nivîskariya we kengî û bi çî awayî dest pê kir?

GALAKSÎ: Ez di du salîya xwe de fêrî xwendin û nivîsandinê bûm. Di dî re heta çar salîya xwe, min ji kovar û rojnameyên cûr bi cûr re helbest û gotarên deribandî û ceribandî nivîsand.

MÎRKUT: Begê min lê pirtûka we ya yekemîn?

GALAKSÎ: Berî vê yekê dixwazim bidim diyarkirin ku di esasê xwe de bavê min dixwest ku ez bibim xerrat. Lê yê min, meraqa min her li ser sen'et edebîyata bilind bû.

MÎRKUT: Begzadê min pirtûka we ya yekemîn?

GALAKSÎ: Bi rastî pirtûka min a yekemîn ji aliyê hevalekî ve hatibû nivîsandin. Ji ber çewtîyê teknîkî navê heval ji ser qapaxê şemitîbû. Dîsa ji ber çewtîyê teknîkî û ji bêpîriya hin zikreşan, navê min herikîbû ser qapaxê û pê ve helyabû.

MÎRKUT: Yanê ew pirtûk ne ya zatê we ye?

GALAKSÎ: Him erê, him na! Ev yeka girêdayî ku mirov çawa meselê dibîne. Êdî herkes û wîjdanê xwe!

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Çiroka vê meselê dirêj e bi rastî. Jixwe ev kompoyek bû li dijî min.

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Ez nuha naxwazim navê wan xêrnexwazên ku li dijî min vê kompoyê çêkirin bidim der. Ji ber ku hê zû ye.

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Eger hûn ji min bawer nakin, ji her sê birayên min û ji zavayê me bipirsîn!

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Welleh bi serê bavê te ez bê gune me!

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Ne min di serî de jî got ku ev kompoya hin dilnexwaza ye.

MÎRKUT: Çawa yanî?

GALAKSÎ: Em Kurd nikarin hevûdu bikşînin. Dilê me naxwaze ku birayekî me yî Kurd pêşkeve û li dunyayê, bi taybetî jî li Awrûpayê nav û dengê xwe belav bike!

MÎRKUT: Em dikarin werin ser pirtûkê?

GALAKSÎ: Ez îro nivîskar û rojnamevanekî naskirî me. Te got Kurd; ez tîm bîra hemû cihanê, lewre hin zikreş min nakşînin.

MÎRKUT: Waaa?

GALAKSÎ: Welleh!

MÎRKUT: Êêê..?

GALAKSÎ: Tu çî vedixwî? Wiskî, şeraba sor, şampa-niya, konyak?

MÎRKUT: Tasek ava sar, sipas. Em werin ser pirtûkê!

GALAKSÎ: Tu weha bikî ez careke din bi te re roportajê nakim!

MÎRKUT: Çima?

GALAKSÎ: Mal ava, ez ji serê siba Xwedê de ye ji te re dibêjim, nizam ku tu ji min bawer nakî? Tu naxwazî bawer bikî? Tu ji min fam nakî? Yan na tu jixwe bêfam î?

MÎRKUT: Em dikarin werin ser pirtûkê?

GALAKSÎ: Rica dikim!!! Binêre....!!!

MÎRKUT: Ez jî rica dikim!!! Lê pirtûkê?

GALAKSÎ: La hewle welaaa..! Binêre..! Ezê..!!

MÎRKUT: Ê bi xatirê te, gelek sipas!

GALAKSÎ: !.....

Los Angeles, 1/10/1985
Muxbîrê Mîrkut ji Amerîka
(Ev nivîs wextekê me di kovara Mîrkut de belav kiribû)

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

*Mûrî rêya xwe ya yekemîn gav bi gav kindikin. Mûriya yekemîn rêya xwe dirêj e. Dema diçe di pey xwe de şopa feromonên bi bêhn dihêlê. Mûriyên din bêhna şopê distînin û hin bi hin rêya xwe kurttir (kintir) dikin. Bêhna şopa feromon çiqas bi qewet be rê jî hewqas kurttir dibe.

*Li gor lêkolînerên psikolojîyê yê Amerîkî dema mirov hîsên xwe yê wek hêrsbûn, xemgînbûn û h.w.d di dilê xwe de dihêle û nade der sihata mirov roj bi roj xirabtir dibe.

*Teknîka sedsala 20 an gelek îmkânên hêja ji bo însan afirandîye. Însan bi teknîka nû çiyayên herf bilind, qitûbên başûr û bakûrê xistiye bin kontrola xwe. Niha însan sirên tarîtiya bin deryayê jî derdixe holê. Berê tu îmkân tunebû ku mirovin tarîtiya deryayê lêbikolê. Lê îro bi teknîka tîrêjen laserê însan dikare sirên tarîtiya

kurahiya behrê jî derxe holê. Firokeyên leşkerî, keştîyên transportê û h.w.d ku di kurahiya behrê de wûnda bûbûn wê dahatûyê de derkevin holê.

*Di dema kevnare de lavîrût ji bo ceribandina xortan dihat bikaranînê. Berê xort dema ji labîrîntê bi serfirazî derdiketin der wek mêr dihatin hesibandinê.

*Ma mirov dikare atoman bi mikroskopê bibîne? Belê, mikroskopa elektronê dikare atomekê milyonek car mezîn bike. Ev tê wê maneyê ku molekulên DNA mirov dikare di forma (şiklê) xwe ya spirali bibîne.

*Mîda mirovî çima xwe bi xwe hezm nake? Mîda mirovî dikare hemû materyalên organîk hezm bike lê pir seyr e ku xwe bi xwe hezm nake! Mîda mirovî asîda xwê hildiberîne û bi vê proteînên di nav xwarinê de dihelîne. Lê mîde li hember asîda xwe û enzûmên li rodîya ku xwarinê dihelîne dikare xwe biparêze. Di mîda mirovî de tebeqeyek (slem) heye û ev naveroka mîde ya tîrş natrolîze dike û zirarê nagihîne mîda mirovî.